


**NÎZAMETTÎN TAŞ**

### Sîstema serokatiyê û pirsa kurd

**NIHA** dinya dixwaze dewleta kurd ava bibe. Êdî tu hêz nema ku astengî li dijî dewlata kurd derbixe. Ji bo ku kurd dewletekê ava bikin her şens, derfet û rewş heye. Biryara referandomê gaveke dîrokî ye. **RÛPEL-03**




### Gramerê Zazakî û Kurmancî

**SERRANÊ** peyênan de warê kurdolojî de xebatê erjayeyî benê. Çi kurmanckî çi kirmanckî bê, tayê nê xebatan zî tezê masterî kê beşanê kurdolojî yê unîversîteyan de temam benê yê. **RÛPEL-11**



### Arşîva dîjîtal: arsivakurd.org

**RIFAT** Sefali xemxûrêk e ku pirtûk, kovar, rojname, bulten, encamên kongre û konferansên partiyên siyasî û belavokan dîjîtal dike û li ser rûpela www.arsivakurd.org diweşîne. **RÛPEL-14**


# bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 13
03 - 09 NÎSAN 2017
www.basnews.com





**LI HERÊMA KURDISTANÊ GAVEKE GIRÎNG**

# KURDISTAN BER BI REFERANDOMÊ VE DIÇE

**SEROKÊ PARTIYA SOSYALÎST DEMOKRAT YA KURDISTANÊ MIHEMEDÊ HACÎ MEHMÛD:**

Serok Barzanî ji rêber û serokên welatên cîhanê re got ku em dixwazin biryar li ser mafê xwe yê çarenivîsê bidin. Cihê kêfxweşiyê ye ku NY razî bûye serpereştiya referandomê bike.

**ENDAMÊ RÊVEBERIYA YNKÊ MISTEFA ÇAVREŞ:**

Referandom li ba YNKê gelekî mijareka girînge. Em wek YNK piştevaniya referandomê dikin. Em piştgiriya xebatên Kak Mesûd Barzanî dikin bo mijara referandomê.



**MURAD CIWAN** >02

Li Başûr sîstema serokatiyê ya federalî



**EKREM ÖNEN** >05

Alfaba pêşin a kurdî latînî û rastiya dîrokî



**FIRAT CEWERÎ** >09

Alfred Nobel



**NADÎRE GUNTAŞ ALDATMAZ** >10

Hem zî Kemane Cineno



## ŞEHÎD QAZÎ Û NEVIYÊN WÎ

Wesiyeta Qazî Mihemed: “Birayên min êdî bi dijmin nexapin. Dijminê we ji kîjan neteweyê dibe bila be, dîsa dijmin e. We bi hev didin kuştin û kesên ji we man jî ew dikujin.”

05



**MECLISA PARÊZGEHA KERKÛKÊ:**

## ALA KURDISTANÊ LI KERKÛKÊ EDÎ NAKEVE

Dİ 28ê adarê de Meclisa Parêzgeha Kerkûkê biryar da ku wê êdî Ala Kurdistanê li saziyên fermî yên Kerkûkê bê daliqandin. Heman demê Ala Kurdistanê li Kerkûkê hat daliqandin.

06



**MURAD CIWAN**

## Li Başûr sîstema serokatiyê ya federalî

Li Başûrê Kurdistanê ji mêj ve ye behsa serxwebûnê tê kirin, lê di gelek warên rêxweşkirinê de yên ber bi serbixweyiyê ve, yekrêziya neteweyî nehatiye peydakirin. Yek ji wan waran jî zelalnebûna awayê sîstema siyasî ya Kurdistaneke serbixwe ye. Diyar e, ne bes ji bo serbixweyiyê, ji bo federalî an konfederaliyeke li gel Iraqê jî pirsa lihevkirina li ser sîstemekê, ku ê bibe jêrxaneya dewleta Kurdistanê, erkeka neteweyî ye.

Li Başûrê Kurdistanê, ji bilî wan deverên ku KCKê dest daniye ser wan û ew radestî bin destê serweriya dewleta Kurdistanê nekirine, de facto, awayek ji awayê 'wesayetî'ya du îdareyî maye. Pişt re, bi rizgarkirina deverên Germiyan, Kerkûkê û Mûsilê ji destê DAEŞê; ew deverên maddeya 140an a destûrê jî, ketine bin destê hêzên Kurdistanî. Li van deveran Şingal bi hebûna tarîxî ya kurdên êzîdî xwedan taybetmendiyekê ye. Li van deran tirkman, ereb, suryanî-asûrî, keldanî hene. Şebek, kakeyî û civakên hûrûgir yên xwedan dîn û mezhebên din li ser erda dîrokî reşiyane, reh dane. Hebûna sunetî û şîetî, ya feyliyan, liberçavgirtinê ferz dikin. Civakên etnîkî û dînî yên cuda li nav îdareya herêmê bi xwe xurt in. Kurdistan mozaîka etnîkî, dînî, mezhebî ya civakan e.

Ji bo vê rewşê, pirsa serxwebûnê neyê rojevê jî, lazim e sîstemeke îdarî ya lêhatî bê dîtin. Lê ku mesela serxwebûnê daket meydanê, divê pirs gelek ji mêj ve hatibe çareserkirin û paşeroja vê mozaîka binavkirî, di nav hidûdê dewleta Kurdistanê de baş hatibe zelalkirin. Heta zelalkirineke li gor daxwaz û hêviyên civakan ê riyê ji bo serxwebûnê pirtir veke, piştgiriyeka xurt a navneteweyî bîne.

Li gel vê rastiya hesas, hêzên siyasî yên Başûr li ser tu sîstemê li hev nekiriye. Hê xetertir, ji dîtin û bizavên wan derdikeve ku serê civakê di vê mesele de ne zelal e. Ew, ne sîstemên îdarî têra xwe nas dike, ne taybetmendiyên xwe dizane da ya lêhatîtirîn ji bo xwe hilbijêre.

Di rewşekê de ku walî û encumenên bajaran bi hilbijartinan dibin desthilat, hin partiyên me, bi navê sîstema parlamenteriyê israr dikin ku serok ji bal parlamentoyê bê hilbijartin. Li alî din, hin partiyên me jî tevî ku walî, encumen û serok ji bal gel tên hilbijartin û ji nuha ve hukumet tevî serokwezîr û wezîrên xwe ji derveyê parlamentoyê tên tesbîtkirin jî, sîstema ku ew dixwazin wek ya parlamenteriyê binav dikin. Ne aheng di sîstema nuha ya Kurdistanê de heye, ne jî çawaniya sîsteman di serê partiyên me de zelal e. Li pişt deriyên daxistî çi amadekarî tên kirin, em nizanin, lê diyar e wek gelek pirsgirêkên din ev jî negihaştine qonaxa çareserbûnê.

Baweriya min ew e ku rewşa mozaîkî ya Kurdistanê, taybetmendiyên tarîxî yên civaka kurdewariyê û rola pirrparçetiyê di paşeroja Kurdistanê de, sîstema serokatiyeke federal kiriye qedereke jêberînebûyî.

Em li tarîxa Kurdistanê binêrin; Kurdistan bi seranseriya xwe tu carî nebûye yek û di bin serweriya take îdareyeke navendî ya unîter de reng venedaye. Ev, di dema modern û kevn de, di perçekirina Kurdistanê de ji bal du an çar dewletên serdest jî, ji bal tarîxa civakên kurdewariyê bi xwe jî wiha ye. Kurdistan hem li alî Îranê, hem li alî Osmaniyan, bi ser hukumdarî, mîrekî, eyaletî û îdareyên eşîrî ve dabeşbuyî bûye. Mîrekiyên Botan, Bedlîsê, Egilê, Hezoyê, Şêrwan, Heskîfê, Hekariya, Behdînan, Soran, Baban, Ardelan, Loristan û wekî tir nimûne ne. Vê rewşê, hin taybetmendiyên dîrokî derxistine ku di xwe-îdarekirina deverî de bûye karakter ji civaka kurdan re. Ne sîstema navendiya unîter, lê ya federalî ji bo Kurdistanê lêhatiye.

Mozaîka Kurdistanê jî ferz dike ku sîstemên eyaletî, muxtariyetên deverî, kulturî-dînî-mezhebî ji bo hemû wan civakên etnîkî, dînî û mezhebi bên durustkirin. Her wekî devereke otonom a bi navê Êzdîxan hebe ku hemû deverên êzîdînişîn bigire nav xwe… yên din jî bi vî awayî…

Sîstema federalî a serokatiyê ê di paşerojê de, bi peydabûna derfetan re, lêhatîtir be ku xwe bi perçeyên Kurdistanê ên din ve entegre bike. Di mînaka Rojava de, ev dikare bibe yekbûneke konfederalî, li perçeyên din, bi peymanên du-sê alî ên avakirina bazarên serbest bibe entegrasyoneke aborî, civakî û kulturî li gel wan parçeyan û dewletên cîran. Dewleta ûnîter a navendî nikare bi wê elastîkiyeta sîstema federal vê entegrasyonê bi serxe.

Bi saya sîstema federalî a serokatiyê li Hewlerê, Silêmaniyê, Dihokê, Germiyan-Kekûkê û Mûsilê ê eyaletên xwedan hukumetên federe ava bibin ku ew bi xwe di warên jiyana rojane de deverên xwe birêvebibin, burokrasiya navendî nikaribe xwe tevî karên wan ê rojane bike. Li ser hemûyan jî hukumeteke federal a serokatiyê ê di meseleyên neteweyî ên giştî de û di warê navneteweyî de Kurdistanê birêve bibe.

Hukumeteke wiha bi saya serokekî hilbijartiyê gel ê xurt ê li hember derva û cîranan gelek xurt be, parlamento partiyên mezin ên bihêz ên bi hilbijêran ve bestî, derxe ku partî bikarin ji sîstema parlamenteriyê bêtir xwe ji derstêwerdana doralî biparêzin.

# Kurdistan ber bi referandomê ve diçe



**KARZAN HEWRAMÎ**

Îsal li Herêma Kurdistanê gaveke dîrokî di riya serxwebûnê de tê avêtin û referandom tê encamdan. Referandom wê ji aliyê NY ve were serpereştîkirin û li hundir û derve jî piştgiriyeke xurt lê tê kirin. Lê heta niha roja encamdana referandomê nehatiye diyarkirin.

Endamê Polîtburoya PDKê Hoşyar Zêbarî li ser referandoma serxwebûna Kurdistanê ji Basê re got; "Biryar hatiye dayîn ku îsal referandom were kirin. Referandom dê bi awayekî be ku nêrîna hemû hêz û partiyan tê de hebe. Ev referandom gaveke girîng e ku xelkê Herêma Kurdistanê mafê xwe yê çarenivîsê diyar bike. Bi rastî referandom bo şertên niha yên Kurdistanê gelekî girîng e, ji ber ku xelkê Kurdistanê biryar daye ji wê riya ku daye pêşiya xwe, venegere. Ji ber vê yekê pêwîstiya kurdan bi wê heye ku daxwaz û nêrînên wan bibin qanûnî û fermî. Ev jî bi riya referandomê re dibe. Serok Barzanî bi xwe jî vê yekê dixwaze û dixwaze îsal referandom li Herêma Kurdistanê were kirin. Em weke Partiya Demokrat a Kurdistanê piştgiriya referandomê dikin û em di wê baweriyê de ne ku divê her welatiyekî kurd bi riya referandomê re mafê xwe diyar bike.

Zêbarî da xuyakirin ku encamdana referandomê nayê wê wateyê ku em yekser serxwebûnê ragihînin yan jî daxwaza cihêbûnê bikin û got, belkî referandom sekoyeke ku em bikarin bi riya wê çarenivîsa xwe diyar bikin."

Endamê rêveberiya PDKê Elî Ewnî jî li ser heman mijarê ji Basê re got; "Partiya Demokrat a Kurdistanê û Serok Barzanî biryara xwe dane ku îsal referandom were kirin. Referandom di bin çavdêriya NY, sazî û dezgehên sivîl û navdewletî de tê encamdan. Ji bona referandomê, tevahiya dezgehên pêwendîdar yên Hikûmeta Kurdistanê di nav amadekariyê de ne. Referandom ji bo deverên Kurdistanî yên li derveyî Herêma Kurdistanê jî girîng e ji ber ku em dibînin hikûmeta Iraqê car caran di bin navê madeya 140î Qanûna Esasî ya Iraqê de destwerdanê li wan deveran dike, hinek caran hêza xwe li wan deran bicih dike, hinek caran bûdceya wan qut dike. Vêca referandom dê vê serêşiyê ji holê rake."

Yek ji damezirênerên Yekgirtû ya Îslam ya Kurdistanê û siyasetmedar Dr. Necman Doskî jî nêrînên xwe li ser referandomê ji Basê re eşkere kir û got; "Mijara referandomê êdî bûye biryar û xelkê Herêma Kurdistanê û rayedarên Kurdistanê biryar dane êdî nebin dûvka tu kesî, êdî tu fermanek bi ser wan de neyê sepandin, êdî rastî wêrankarî û zordariya neyên. Xelkê Kurdistanê careke bi Pêşmerge li hember êriş û zilmê rawestiya vê care jî bi riya referandomê li hember her cure zordarî û tehdîdekê derdikeve û mafê çarenivîsa xwe diyar dike. Bo vê jî em ji NY, Amerîka û hêzên hevpeyman dixwazin di mijara referandomê de piştevanî û alîkariya me bikin. Ez wisa hizir dikim ku rayedarên Kurdistanê bi taybet Kak Mesûd di mijara referandomê de Amerîka, NY û welatên Ewropa jî agahdar kirine. Mirov dikare bêje di asta navdewletî de jî piştevaniyeke mezin bo referandomê heye û di nav Kurdistanê de jî piştevaniyeke mezin heye bo vê yekê. Ji ber wê jî em çave rê dikin gelê Kurdistanê îsal biryara xwe bide."

**Îsal li Herêma Kurdistanê gaveke dîrokî di riya serxwebûnê de tê avêtin û referandom tê encamdan. Referandom wê ji aliyê NY ve were serpereştîkirin û li hundir û derve jî piştgiriyeke xurt lê tê kirin. Lê heta niha roja encamdana referandomê nehatiye diyarkirin.**

Endamê rêveberiya YNKê Mistefa Çavreş jî wiha helwesta YNKê li ser referandomê ji Basê re eşkere kir. "Em wek YNK piştevaniya referandomê dikin, em her wiha piştgiriya xebatên Kak Mesûd Barzanî dikin bo mijara referandomê. Referandom li ba YNKê mijareke gelekî girîng e ji ber ku em di wê baweriyê de ne dive gelê Kurdistanê bi referandomê mafê çarenivîsa xwe diyar bike. Helbet ev jî piştî diyalog û lihevkirina partî û hêzên siyasî pêk tê. Diyalog û hevdîtin di navbera partiyan de ji ber wê yekê pêwîst e da ku em bikarin amadekariyên xwe bikin, roja referandomê destnîşan bikin, her wiha kêşeyên ku tên pêşiya me, çareser bikin, vêca ji ber van tiştan YNK ne tenê piştgiriya referandomê dike di heman demê de di wê baweriyê de ye ku niha dema wê ye ku gelê Kurdistanê biryar li ser mafê xwe bide. YNK di wê baweriyê de ye ku gelê Kurdistanê gelek qurbanî daye ji ber wê ji bona ku qurbanî û destkeftên me ji nav neçin dive piştevaniya referandomê bê kirin. Em hemû dizanin ku heta niha jî Bexdayê çave xwe berdaye xaka Kurdistanê, dive tevahiya xaka Kurdistanê vegere ser Kurdistanê ji bona vê jî divê referandom were kirin."


Berpirsê Komîsyona Hilbijartin û Referandomê li Herêma Kurdistanê Hendirên Mihemed jî ji Basê re got ku komîsyona hilbijartinan amade ye bo encamdana hilbijartin û referandomê. Hikûmeta Kurdistanê bûdceya pêwîstî jî terxan kiriye. Em di wê baweriyê de ne komîsyon dikare bi awayekî serkeftî referandomê encam bide."

Mamostayê zankoya Silêmaniyê Dr. Keywan Azad jî ji Basê re behsa referandomê kir û got; "Herêma Kurdistanê û Serok Barzanî biryar dane referandom were kirin. Bi encamdana referandomê re gelê Kurdistanê digihê armanca xwe. Êdî nabe gelê Kurdistanê cardin bindest bibe. Em bo sê tiştan referandomê dikin; sînorên Kurdistanê tên diyarkirin, helwesta gelê Kurdistanê bo hemû cîhanê tê eşkerekirin û mijara serxwebûn û dewleta Kurdistanê yekalî dibe. Em di wê baweriyê de ne piştî referandomê êdî qonaxa serxwebûn û ragihandina dewleta kurdî destpê dike. Eger gelê Kurdistanê di tu tiştekî de jî li hev nekin li ser mijara referandom û serxwebûnê û dewleta kurdî de pişta Serok Barzanî digirin."

Serokê Partiya Sosyalîst Demokrat ya Kurdistanê Mihemedê Hacî Mehmûd ji Basê re mijara referandomê nirxand û got; "Referandom mafekî rewa yê gelê Kurdistanê ye. Di serdana vê dawiyê ya Serok Barzanî de, ku ez jî pê re bûm, Serok Barzanî ji rêber û serokên welatên cîhanê re got ku em dixwazin biryar li ser mafê xwe yê çarenivîsê bidin, ji ber wê jî em dixwazin gelên cîhanê agahdarî vê yekê bibin. Wan piştgiriyek baş dan peyam û daxwaziyên Barzanî û gelê Kurdistanê. Helbet referandom bi piştevaniyeke xurt ya navdewletî, bi piştevaniya Amerîka û NY tê encamdan. Cihê kêfxweşiyê ye ku NY razîbûye serpereştiya referandomê bike. Kak Mesûd îsal xebatên xwe yên diplomatik bo referandomê zêdetir û xurttir dike her wiha partiyên Kurdistanî jî piştevaniyeke mezin didin, bi vî rengî îsal referandom dê bi piştevaniyên navdewletî û navxwe were encamdan. "

**Mihemedê Hacî Mehmûd: "Referandom mafekî rewa yê gelê Kurdistanê ye. Di serdana vê dawiyê ya Serok Barzanî de, ku ez jî pê re bûm, Serok Barzanî ji rêber û serokên welatên cîhanê re got ku em dixwazin biryar li ser mafê xwe yê çarenivîsê bidin, ji ber wê jî em dixwazin gelên cîhanê agahdarî vê yekê bibin. Wan piştgiriyek baş dan peyam û daxwaziyên Barzanî û gelê Kurdistanê."**







Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî di hevdîtina bi Sekreterê Giştî yê NY Antonio Guterres de jî behsa referandomê kiribû û daxwaz ji wî kiribû serpereştiya referandomê bike.

## Nîzamettîn Taş:

# “Emê te nekin serok” Demîrtaş avêt girtîgehê

AHMED HADİOĞLU



**Ala Kurdistanê li Kerkûkê hat daliqandin. Piraniya gel piştgirî da divê ev yek çawa bê şîrove kirin?**

Li Kerkûkê rojên dawîn nîqaş li ser alê çêdibe. Biryara bilindkirina Ala Kurdistanê a li Kerkûkê divê wekî biryarek derengmayî bê hesibandin. Divê al berê bi awayekî fermî bihata daliqandin. Herçiqas dereng be jî biryareke girîng û stratejîk e. Gelê kurd û kêm neteweyên din jî piştgiriyê didin. Ez hêvî dikim di vê mijarê de gavek paş de neyê avêtin.

**Çima gavên paş de bê avêtin?**

Hin parlamenterên Yekgirtî û Tevgera Goranê digel Iraqê tevdigerin. Hin kesên di nav van partiyan de jî dixwazin gavên paş bên avêtin. Lêbêlê ne hêz ne jî bandora wan heye.

**Partiyên din ên li Herêma Kurdistanê ji bo vê mijarê çi dibêjin?**

Bi qasî ku min fêm kir partiyên din ên Kurdistanê xwedî li vê mijarê derketin. Him bi ser navê hikûmetê him jî li ser navê partiyan daxuyanî hat dayîn. Herkes piştgiriyê dide bo bilindkirina Ala Herêma Kurdistanê ya li Kerkûkê. Kerkûk bajarekî kurdan e û dilê Kurdistanê ye. Tiştekî xwezayî ye ku Ala Kurdistanê li wir tê daliqandin.

**Bo Ala Kurdistanê daxuyaniya PKKê hebû.**

Erê. Bi awayekî neyînî PKKê sekna xwe nişan dabû. Ew jî dibêjin “Ew ne Ala Kurdistanê ye, ala PDKê û hikumetê ye.” PKK, bi vê axaftina xwe sekneke ne baş da xuyakirin. PKK bi vê helwestê, partiyên ku dixwazin bi Iraqê re tevbigere yên wek Goran û Iraq lê sor bike. Lêbelê ew divê bi awayek cidî neyê hesibandin. Heza van jî tune ye. Li vir ya girîng piştgiriya gel û hikûmetê ye, ev yek jî pêk hat. Hin nûnerên partiyên Goran û Yekgirtî dibêjin ku; “Parêzgerê Kerkûkê digel hikûmeta Kurdistanê û Barzanî tifaq danîn û wisa ala li Kerkûkê hat daliqandin.“ Her wiha PDK, hikûmet û Barzanî jî piştgirî dane bo bilindkirina alê.

**“TIRKMEN LI DIJÎ ALA KURDISTANÊ DERNAKEVIN”**

**Divê mijarê de tirkmen çi difikirin?**

Di çapemeniya tirkan de propaganda tê kirin tirkmen li dijî alê derketine lê rastî ne wisa ye. Bi tenê perçeyekî piçûk ê partiyeke wek MHPê gelek piçûk protesto kir. Piraniya eşîrên tirkmen û ereb di daxuyaniyên xwe de piştgiriyê dane kurdan bo bilindkirina Ala Kurdistanê. Bi tenê ev piştgirî di çapemeniya tirkan de dernakeve.

**Bi ya we Ala Kurdistanê a li Kerkûkê hat daliqandin hemû gelan temsîl dike?**

Ala Kurdistanê ne tenê kurdan, tirkmen û kêmneteweyên din ên li Kerkûkê dijîn jî temsîl dike. Kurd bi awayekî kelecan bilindkirina alê pêşwazî kirin, gelên din jî bi aweyekî normal hurmetê nîşandan.

**“TU HÊZ TUNE YE KU ASTENGÎ LI DIJÎ AVABÛNA DEWLETA KURD DERBIXE”**

**“Barzanî, Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî Antonio Guterres re behsa referandoma serxwebûnê kir ku ew ê pêk were. Bi ya we li vir peyamek taybet heye?**

Ya rast divê qet referandûm neye kirin, serxwebûn bê eşkere kirin. Daxwaza her kurdekî jî ev e. Lê Hikûmeta Kurdistanê bi referandomê dixwaze di têkiliyên navneteweyî de mafdarî û rewatiyek ava bike. Referandom heke di bin çavdêriya Neteweyên Yekbûyî de bê kirin wê fermî bibe. Barzanî jî vê daxwazê ji sekreterê NYê re got. Niha dinya dixwaze dewleta kurd ava bibe. Êdî tu hêz nema ku astengî li dijî dewlata kurd derbixe. Ji bo ku kurd dewletek ava bikin her şens, derfet û rewş heye. Heke referandom di bin çavdêriya Neteyewên Yekbûyî de bê kirin wê fermiyeta wê jî ê hebe. Lêbelê ew bi awayekî eşkere vê yekê bi lêv nakin. Heke bi riya referandomê dewlet bê îlankirin wê piştgiriyeke navneteweyî çêbe. Bi vî awayî dê bi pirsgirêkên hindiktir dewlet were avakirin. Serdana Sekreterê Neteweyên Yekbûyî ya bo Kurdistanê gelek girîng e. Peyama Barzanî a wek ‘em ê referandoma serxwebûnê çêbikin’ daxuyaniyeke dîrokî ye.

**Piştî ku daxuyaniya ‘emê referandoma serxwebûnê çêbikin’ a Serokê Herêma Kurdistanê Mesud Barzanî, ji Tirkiyeyê bertekek neyînî hat.**

Li Tirkiyeyê ji bo referandomê, fişareke mezin ji neteweperestan heye. Jixwe Tirkiye li gorî hişmendiya xwe li dijî referandoma Kurdistana serbixwe ye. Wek dewlet van daxuyaniyan mecbûr dide. Tirkiye jî Iraq jî Îran jî û Sûrî jî bo dewleta kurdî naxwazin. Ji bo kurdan sekna Amerîka û Ewropayê gelek girîng e. Divê kurd xwe paş ve nekişînin. Qîmeta gotinan tune ye. Êdî mafê tu dewletê tune ye ku bibêje “Çima kurd dewlet ava dikin.“

**Gelo Tirkiye polîtîkayên berê bi rê ve dibe?**

Berê Kerkûk bo Tirkiyeyê “xeteke sor“ bû, sedema şer bû. Di navbera Tirkiye û Herêma Kurdistanê de sedema gelek gengeşiyan Kerkûk bû. Dema mirov polîtîkayên berê yên Tirkiyeyê binêre niha polîtîkaya alê gelek nerm e. Çawa min got, ev daxuyanî ji bo raya giştiya nava Tirkiyeyê ne. Tirkiye diçe referandomê mecbûre ku vê ya bike. Lê ez texmîn nakim ku bi awayekî ne li dijî alê ne jî bo tiştek din astengî çêbike. Referandom beriya her tiştî biryara kurdan bi xwe ye. Hikûmeta Kurdistanê divê bi xwe bawer û li gorî berjewendiyên xwe her rîskê jî bide ber çavên xwe û wisa tevbigere. Bi ihtîmal Tirkiye wê nerazîbûna xwe nîşanî referandoma Kurdistanê bide. Iraq jî nerazî ye. Ew jî dibêjin “Mafê kurdan a avakirina dewletê heye lê di pratîkê de pirsgirekan çêdike.” Tirkiye jî tiştan wek van dibêje. Lê mîna berê ne hêzên van heye asteng bikin ne jî rewşeke wisa heye. Hêzên navneteweyî jî kurd jî destûr nadin vê yekê.

**“ŞINGAL PERÇEYEKÎ KURDISTANÊ YE”**

**Derheqê polîtîkayên PKKê yên Şingalê de hûn çi difikirin?**

Li Şingalê rewş li gorî berê aram e, lê pirsgirêk berdewam dikin, xilas nebûne. Heke PKKê hêzên xwe venekişîne dibe ku ji nişka ve pevçûn derkeve. Îran dixwaze li Şingalê navenda Heyva Şîayî ava bike. Li nêzî PKKê hêzên çekdar ên Heşdî Şebî hene. Ev hêzên ku dibêjin Yekîneyên Berxwedana Şingalê (YBŞ) girêdayî Heşdî Şebî ne û ji vir pere digirin. Li wir projeya serokwezîrê berê yê Iraqê Nurî El Malikî tê birêvebirin. Projeyeke gelek bi talûke ye. Malikî dixwaze ew der ji bo Îranê bike navendek. Heke Heşdî Şebî li Şingalê bi cih be wê di navbera Herêma Kurdistanê, Kurdistana Bakur û Rojava de Îran bi cî be. Bi rastî ev proje ew e ku wekî ku Kurdistan bi xençerekî dê bê perçe kirin. Îran li Şingalê PKKê teşwîq dike, mehanî dide, van fînanse dike. Niha di nav xelkê êzdî de bi dizî propaganda dikin û dibêjin “êzdî ne kurd in.” Fermandarekî YBŞ li televizyonekê bi xwe jî got “em ne kurd in.“ Ev polîtîkayên bi talûke ne ku dixwazin Şingalê ji Kurdistanê veqetînin. Şingal perçeyê Kurdistanê ye. Peşmerge bi salan e şer kiriye û Îran jî dixwaze vê axê veqetîne û bi Iraqê ve girê bide. Ji vê xeternaktir proje heye? Îran dixwaze bi destê PKKê van projeyan pêk bîne. Armanca gotina PKKê ya ‘bila Şingal bibe xweser’ ew e ku dixwaze Şingalê bi Iraqê ve girê bide. Niha kurd jî Amerîka jî destûr nadin. Divê PKK hemû hêzên xwe ji Şingalê vekişîne. An wê her carî pirsgirêk çêbe. Her wisa di wextên pêş me de Heşdî Şebî dê bo kurdan bibe hezeke xeternak.

**Îran çima tiştek wisa dike?**

Armanca Îranê a li vir ew e ku dixwaze astengî li ber dewleta kurd danê. Di pratîkê de him armanca Îranê him jî ya Malikî heye. Îran bi destê PKKê li Şingalê pirsgirêk çêdike. Li Kerkûkê jî bi destê Heşdî Şebî dike. Tu ferqa Heşdî Şebî ji DAIŞê tune ye. Talûkeya DAIŞê zêde nema. A rast ji bo kurdan talûkeya esil Heşdî Şebî û hezên giredayê wan in.

**“PIRSA KURD DI NAV PERGALA SEROKATIYÊ DE WÊ BÊ ÇARESERKIRIN”**

**Li Tirkiyeyê demeke nêzîk wê hilbijartina referandomê bê kirin. Divê kurd bo vê hilbijartinê seknek çawa nîşan bidin?**

Kurd wekî piştgirê ‘erê an jî na’ye refendomê şîrove dikin ev yek şaş e. Divê kurd li gorî berjewendiyên xwe tevbigerin. Divê derdê kurdan ne parastina pergala dagirker a sedsalî be. Heta niha sedema hebûna rêxistinên kurd ên ku derketine holê hilweşandina pergalên dagirker bû. Niha radibin bi gotinên dîktator û yek merivê xweyî derketina pergalê, zirarê dide kurda.

**Pergala Serokatî wê pirsa kurd çareser bike?**

Heke tê xwestin pirsa kurd bi riya siyaset û demokrasiyê bê çareserkirin ev yek teqez di nav pergala serokatiyê de wê pêk were. Çimkî di pergala unîter de netewek din nayê qebûl kirin. Di pergala serokatiyê de, an federasyon an jî pergala eyaletê heye. Dibe ku ev her du tişt jî di pirsa kurd de cihekî girîng bigre. Ji bo çareserkirina pirsa kurd divê yek jî berxwedana pergala serokatî pêk were.

**Yanê kurd di referandûmê de divê bêjin ‘erê’?**

Ez nemaze nabêjim kurd ‘erê’ an jî ‘na’. Ev tercîha wan e. Heke Tirkiye bixwaze pirsa kurd çareser bike mecbur e ku derbasî pergala serokatiyê bibe.

> Heke referanom di bin çavdêriya Neteweyên Yekbûyî de bê kirin wê fermiyeta vê jî çêbe. Barzanî jî vê daxwazê bi awayekî fermî got. Niha dinya dixwaze dewleteke kurd ava bibe. Êdî tu hêz nema ye ku astengî li dijî dewlata kurd çêkin. Ji bo ku kurd dewletekê ava bikin her şens, derfet û rewş heye.



### SEDSALA 21. SEDSALA KURDAN E

**Partiya Demokratˆk a Gelan, kampanyaya ‘Na’ a bo referandomê dimeşˆne vê yekê çawa şˆrove dikin?**

HDPê bi hişmendiya çepên tirk tevdigere û ev yek şaş e. Li paşerojê de bi gotina “emê te nekin serok” kampanya dabûn dest pêkirin. Dibe ku ev yek bi tenê vegotinek bû lê dema ku em encama kampanyayê binêrin, 80 parlamenter ji destê HDPê çûn. Ji sedî 13 heba bû. Kurd bi vê yekê re hêrs bûn û destê xwe ji HDPê vekişandin. Selahattin Demirtaş jî ji ber vê siyaseta şaş niha di girtîgehê de ye. Ev siyaset, dafika çepê tirk, kemalîzm û yên ku naxwazin kurd xwedî hêz bin bo kurdan bû. Piraniya kesên ku piştgiriya kampanyaya ‘Na’yê a HDPê dikin dibêjin ev referandom wê Tirkiyeyê perçe bike. Kurd bedel didin lê yên ku HDPê bi rê ve dibin kemalîst in. Divê kurd êdî li gorî berjewendiyên xwe tevbigerin. Li gorî hişmendiya kemalîst, netewperest û şovenîstan kurdan dixe nav dafikan. Ji çepên tirkan çend kes hatine girtin, lê gelek sîyasetmedarên HDPê niha di girtîgehê de ne.

**Soza sedsala 21. bo kurdan heye?**

Sedsala 21. sedsala kurdan e. Wekî mînaka DAÎŞê ji bo kurdan kîjan dafik bê kirin jî kurd teqez wê bi ser kevin. Lewre li Herêma Kurdistanê wê dewletek bê avakirin. Tesîra wê li ser perçeyên din ên Kurdistanê jî bibe. Li wir wê bo çareseriya pirsa kurd rê veke. Divê kurdên bakur berjewendiyên xwe bifikirin û sîyasetek nû biafîrînin. Ez bawer dikim li bakur wê pêkhateyên nû çêbe.



**HOŞENG OSÊ**

## Tevgera Apociyan û rêjîma Esed: Evîna ji aliyekî

Di roja 10.6.2000î de Hafiz Esed mir. Parlementoya Sûrî di cih de civiya û Beşar Esed kir serokkomar. Wê çaxê, konseya serokatiya PKKê nameyeke sersaxiyê ji rêjîmê û malbata Esed re şand û ev name di rûpelê yekemîn a rojnameya “Serxwebûn”ê de, hejmara 222an ya Hezîrana 2000î de belav kir. PKK di nameya xwe ya sersaxiyê de wisa dibêje: “Di van rewşên dijwar de, bi xemgîniyeke giran, me nûçeya koçkirina damezrînerê Sûriya nûjen, serokê niştimanperwer, dostê gelê kurd yê bi nirx û hêja û serokê cîhanî yê bêhempa Hafiz Esed, bihîst. Bi navê serokê giştî Abdullah Öcalan, rêhevalên wî û partiya xwe, em sersaxiyê ji hemû berpirsên Komara Ereb ya Sûrî re, ji malbata Esed re, ji hemû gelên ereb û kurd ên Sûriyê re, ji hemû cîhana ereb re û ji hemû gelên herêmê re dixwazin. Em digel malbata Esed û gelê ereb şîn û xemgîniya wan di vê bûyera giran de parve dikin.”

Rêjîma Esed guh neda van pesnan û di warê pêkanîna peymana Adana de bi tirkan re berdewam kir. Di sala 2001ê de konseya serokatiya PKKê xwest Rustem Cûdî (di 27.9.2011ê de jiyana xwe ji dest da) bibe berpirsê rêxistinê li Sûriyê, lê rêjîma Sûriyê ji Cemil Bayık re got: “Yan hûn ê Cûdî ji vira bibin yan em ê wî bigirin, yan bikujin.” PKKê Rustem Cûdî ji Sûriyê derxist û Xebat Amed kir berpirsê PKKê li Sûriyê. Piştî salakê, Xebat Amed û alîkarê wî jî hatin girtin û rêjîma Sûriyê ew radestî Tirkiyê kirin. Piştî vê bûyerê, rêjîma Sûriyê dest danî ser mal û vîlleyên Ocalan û her sê kampên PKKê ku li Şamê bûn û PKK bi yek carî li Sûrî hate qedexekirin.

Piştî damezrandina PYDê, di 2003yan de rêjîma Sûrî êrişeke dijwar li ser dost, alîgir û endamên PKK-PYDê kir û bi sedan kes girtin û bi dehan ji wan radestî Tirkiyê kirin. Di destpêka sala 2011an de ez li Belçîkayê bûm û di beşê erebî yê “ROJ TV” de weke edîtorê nûçeyan dixebitîm. Şoreşê li Tûnisê dest pê kir û berê xwe da Misrê. Wê çaxê, ji berpirsê me yê ragihandinê Mustafa Karasu perspektîf û ferman da ku em gel hêrs bikin ku li himberî rêjîma Esed rapere û serî hilde. Me gelek programên taybet bi zimanên kurdî û erebî li dij Esed çêkirin. Êdî Roj TV bûbû mala opozîsyona Sûrî. Jixwe dema di 15ê Adara 2011an de, serhildanê li Sûrî rû da, me propaganda li dijî rêjîma Esed hîn gurtir kir. Lê piştî ku Ocalan hin daxuyanî derbarê rewşa Sûriyê de dan, hêdî hêdî, êdî piştgiriya PKK û ragihandina wê ya ji bo serhildana gel a li Sûriyê hate guhertin û PKK-PYDê guman davêtin serhildan û şoreşa Sûriyê û gelek bihane derdixstin holê da ku kurdan ji şoreş û xwepêşandanan dûr bixin. PKK-PYDê digot: “Ev çi şoreş e, ma şoreşên bê serok hene, ma şoreş bê partî û têwrî dibe, çima xwepêşandan di rojên înan de û ji mizgeftan dertên?..” Berî ku çek û hêzên tundrew têkevin Sûriyê, PKKê çek û bi dehan şervanên xwe şandin Sûriyê. Serokê PYDê S. Muslim, di çarçoveya peymana di navbera PKK û rêjîma Esed de vegeriya Sûriyê.

Baş e, Ocalan çi got ta ku hevkariya di navbera PKK û rêjîma Esed de ji berê çêtir vegerand!?

Di roja 6.4.2011an de û bi rêya parêzeran re Ocalan daxuyaniyek da û tê de got: “Eger Esed rêformên demokratîk çêbike, em ê piştgiriya wî bikin. Dikare hin mafên çandeyî qebûl bike, rêvebiriyên herêmî pêş bixe, rê li pêşiya kurdan veke da ew xwe rêvebibin. Divê Esed nasnama kurdan nas bike. Eger Esed wisa bike, em ê li pişta wî bin.” Û di roja 13.4.2011an de, Ocalan got: “Sûrî ji bilindbûna pêla opozîsyonê ditirse, lewma dixwaze kurdan bê alî bike. Gelo Sûriyê hevdîtin bi PYDê re çêkir? Gerek hevdîtin bi berpirsên Sûrî re li ser bingeha xweseriya demokratîk werin çêkirin. Eger qebûl kirin, em ê piştevaniya Esed bikin.” Û di roja 4.5.2011an de Ocalan di daxuyaniya xwe de got: “Serhildan li Sûrî berdewam e û cemaeta Uxwan Elmuslimîn jî êdî dixwaze tev li xwepêşandanan bibe. Bingeha dîyalogê bi rêjîmê re heye. Ji Esed re bêjin: Eger cemaeta (Uxwan Elmuslimîn-Birayên Misilman) were ser desthilatê, dê komkujiyan li dij me û we (kurd û elewî) pêk bîne. Divê diyalogê bi Esed re bikin û dibe ku bigihêjin çareseriyeke demokratîk.” Û di roja 18.5.2011an de Ocalan ji PKK xwest ku bi rêjîma Sûrî û Îranê re hevkariyê bike û got: “Dibe ku di vê demê de kurd bi Îran û Sûriyê re li hev bên. Ez wan hişyar dikim; divê hûn û kurdan li hev bên. Eger Sûriye qebûl neke, wê çaxê divê kurd bi opozîsyona Sûrî re tevbigerin”.

Ji van daxuyaniyan eşkere dibe ku Ocalan pir dixwest PKK bi rêjîmên Sûrî û Îranê re li dijî şoreş û serhildana Sûrî û li dijî opozîsyonê derkeve.

Qeyrana Sûrî:

# Li Sûrî şer, li Cenevê hewla bêhêviyê!




**Li Sûrî rojhilatê Gutayê, Hama, Dera û li Îdlîbê şer her ku diçe tundtir dibe û alîgirên şerê navxweyî yê Sûrî ji bo çareseriyê li Ceneva paytexta Swîsre dicivin. Lê hevdîtin bê hêvî û sûcdarkirinan berdewam kirin.**



**DERYA KILIÇ**

Li Sûrî rojhilatê Gutayê, Hama, Dera û li Îdlîbê şer her ku diçe tundtir dibe û alîgirên şerê navxweyî yê Sûrî ji bo çareseriyê li Ceneva paytexta Swîsre dicivin. Hevdîtina Cenevê a pêncemîn di 23yê adarê de destpêkir û heta 1ê meha nîsanê berdewam kir. Lê hevdîtinan bêhêvî destpê kirin. Ji ber ku li aliyekî ve serokê rejîma Sûrî, alîgirên wî û muxalif êrişên xwe zêde kirin û li aliyê din li Cenevê li hev nekirin. Muxalifên Sûrî berî rûniştina Cenevê a pêncemîn Astanaya sêyem boykot kiribûn. Ji ber wan hemû rûdanan nûnerê NY ê Sûrî Staffan de Mistura di daxuyaniya xwe de got: “Hêviyeke min a mezin tune ye û ez bawer nakim tiştekî baş bê bidestxistin. Divê kes li benda hêviyên mezin nesekinin û alozî dê berdewam bikin.” Herwiha Mistura di heman gotinên xwe de ji bo Ceneva çaremîn ku di navbera 23yê Sibatê û 1 Adarê de hatibû lidarxistin, gotibû.

Ji aliyê din şûna çareserî û rojeva beşdarbûnan, êrişên Sûrî girtin. Muxalif û nûnerê Sûrî weke hevdîtinên din rû bi rû neaxivin jî di civîn û daxuyaniyên xwe de hevdû sûcdar kirin. Nûnerê Sûrî yê NY Beşar Caferî diyar kir ku muxalif di bin hevdîtinan de bi awayekî qestî êrişên xwe zêde kirin. Prosesa hevdîtin û polîtîk fiyasko ye. Danûstandin karê sereke û Serokê Şandeya Dijbereya Sûrî Nasir Hariri jî da zanîn ku rejîm bi çekên giran êrişî sivîlan, nexweşxanan û dibistanan dike.

### Mijarên Ceneve

Mijarên Ceneva pêncemîn di Ceneva çaremîn de hatibûn diyarkirin. Di hevdîtinan de ji bilî êriş û koçberan rojeva wê ya sereke veguhestina rêveberiyê, destûra bingehîn, hilbijartin û teror in. Muaxalifan carekî din eşkere kirin ku ayendeya Esad divê bê tayînkirin û êdî Esad naxwazin û di projeya wan de Esad tune ye. Mijarên din jî şandina alîkariyê ji bo sivîlan û agirbest bû. De Mistura jî daxwaz kir ku agirbest bê domandin. Çavkaniyên muxalifên ku Heftenameya Basê bi wan re axivî; diyar kirin ku hêviya wan zêde ji hevdîtina Cenevê tune ye. Lê mijarên siyasî êdî têne axaftin. Vê carê dê çareseriyek neyê peydakirin. Lê ji bo Ceneva din gavên baş têne avêtin.

Herwiha Mistura reşnivîsek pêşkêşî muxalif û nûnerên rejîmê kir. Reşnîvis derbarê veguhestina rêveberiyê, destûra bingehîn, hilbijartin û teror de bûn. Wê di dawiya hevdîtinan de naveroka wê diyar bibe.

Serokê Berê yê Meclisa Tirkmenan Abdurrahman Mustafa derbarê hevdîtinên Cenevê de bi Basê re axivî.

### Mustafa: Di hevdîtinan de hîn jî tu pêşketin yan jî encameke berbiçav nehatiye bidestxistin

Abdurahman Mustafa zanyariyên ku derbarê Ceneva pêncemîn de li ber destê wî hebûn, bi Basê re parve kirin û diyar kir ku herdu alî raste rast bi hevdû re naaxivin. De Mustra bi her du aliyan re cuda cuda hevdîtinan çê dike. Di hevdîtinan de hîn jî ti pêşketin yan jî encameke bebirçav nehatiye bidestxistin. Lê mijarên siyasî tên axaftin.

Mustafa axaftina xwe wisa domand: “Li gorî min ev rûdaneke girîng e. Herçiqas encameke baş neyê bidestxistin jî ji bo hevdîtinên sibêrojê gavên baş têne avêtin. Rejim di hevdîtinên 2012, 2014 û 2016an de qet nexwest mijarên siyasî biaxivin. Cara yekem e ku rejîm di Cenevê de sibêroja xwe ya siyasî diaxive. Ji bo me jî ev girîng e. Lê wisa xuya ye ji bo çareseriyê hîn wext heye. Ev proseseke dirêj e.”

Mustafa careke din mijarên hevdîtinan bi bîr xist û rave kir ku veguhestina rêveberiyê, destûra bingehîn û yaseya hilbijartinan tê axaftin. Piştî Cenevê dê encama wan mijaran diyar bibe. Li Ceneve mijarên penaber, koçber û alîkariya mîrovahî jî hatin axaftin. Em weke muxalefetê me belgeyan pêşkêşî de Misturayê kirin.

Mustafa bal kişand ser rêşnivîsa Staffan de Misturayê û diyar kir ku de Mistura derbarê veguhestina rêveberiyê û hilbijartinan de rêşnivîsek pêşkeşî muxalif û rejîmê kir û bi vî awayî fêrî nêrînê herdu aliyan dibe. Li gor min wê hevdîtinên Cenevê ê bidomin.

Mustafa derbarê agirbestê de jî wisa got: “Ez nikarim bibêjim agirbest bi awayekî baş tê cîbicîkirin. Lê hindek jî tê cîbicîkirin û tevî îhlalkirinan jî hê agirbest berdewam dike.

### ENKS: Muxalif li dijî meseleya kurdan astengî derdixin

Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) weke hevdîtinên Ceneva çaremîn beşdarî ya pêncemîn jî bû. Ji ENKSê Ebdulhekîm Beşar û Fûad Elîko di hevdîtinên Cenevê de hazir bûn. ENKS weke şandeyeka kurd di Şandeya Bilind a Dijbereya Sûrî de cih girtin. Di heman demên hevdîtinan de di navbera muxalifan de pirsgirek derket. Li gor zanyariyên ku Basê bi dest xistine ENKS rêşnivîsek pêşkêşî Nûnerê NYyê Sûriyê Stafan de Misturayê kiriye, muxalif jî aciz bûne. ENKS jî ji ber hewla muxalifan biryara boykotkirina hevdîtinan da. Herwiha hat îdiakirin ku endamên ENKS ji şandeya xwe ya Cenevê aciz in û dixwazin bêne guhertin. Lê endamê ENKS vê îdiayê red dikin.

Endamê ENKS Fuad Elîko ji Cenevê bersiva pirsên Heftenameya Basê da û hewla muxalifan rexne kir.

### Elîko: Heger muxalif ji niha vê li dijî meseleya kurdan tevbigerin, dê sibêrojê gelek astenga derxin”

Endamê ENKS Fuad Elîko bal kişand ser armancên xwe û wisa got: “Me xwest daxwazên kurdan pêşkêşî de Misturayê bikin. Lê muxalif razî nebûn û reaksîyoneke neyînî nişan dan. Em heta niha nizanin ji bo çi nexwestin. Me dixwest li ser pêşnûmaya me goftego bêne çê kirin û bê vêkolandin. Pişt re em qaneh bûn ku muxalîf dê vê qebûl nekin. Li ser vê gelek nîqaş çê bûn. Heger muxalif ji niha vê li dijî meseleya kurdan tevbigerin, dê sibêrojê gelek astengan derxin. Heke niha nexwazin wan meseleyan çareser bikin, dê pişt re qet çareser nekin.”

Elîko diyar kir ku heger ew kesên ku ji wan nêrînên xwe yên çewt vegerin û em li hev bikin, em dê danûstendinan bidomînin û beşdarî rûniştinên Ceneve ye din bibin. Heger na bi vî awayî di sibêrojê de pirsgirek wê çê bibin û em dê beşdar nebin. Herwiha em dê de Misturayê jî agahdar bikin.

### QEYRANA PENABERAN BÛYE GIREKA CÎHANÊ

Şerê navxweyî yê Sûrî çawa bûye girêka Rojhilata Navîn û cîhanê; qeyrana penaberên Sûrî jî bûye kêşeya mezin ya cîhan û Rojhilata Navîn. Ji ber ku welatên Afrîqa, Ewropa û DYAyê ev bû 6 sal hewl didin ku vê kêşeyê çareser bikin. Lê tu çareserî heta niha nehatiye peydakirin. DYA li gor xwe qedexe anî. Tirkiyê û Yekîtiya Ewropayê (YE) jî Peymana Şundevegerandinê îmze kirin. Lê ti derman tune ye û hejmara penaber û koçberên Sûrî her ku diçe zêde dibe. Li gor hejmarên ku NYyê ragihandiye; hejmara penaberan 5 milyon derbas kiriye û bûye 5 milyon 18 hezar 168. Li Tirkiyê 3 milyon, li Libnan 1 milyon 11 bîn 366, li Ûrdûnê 657 hezar, li Iraqê 233 hezar 224, li Misirê 120 hezar 54 û li welatên başûrên Afrîqayê 29 hezar 275 û li welatên Ewropayê 884 bin 461 bûne û Li Ewropayê ji sedî 64 li Almanya û Swêdê ne. Herwiha ev hejmar ne rast in. Çimkî penaberên ku nehatine qeydkirin, di nava wan hejmaran de tune ne.

Li aliyê din penaberên Erebistana Seûdî û Mîrnişînên Erebî yên Yekbûyî ji ber ku Peymana Penaberan îmze nekirine, statûya penaberan nadin. Lê tevî îmzeya Tirkiyê bine vê hebe jî, heger kesekî ji Ewropayê neyê xwediyê vê statuyê nabin. Rewşa penaberan li wan welatan di warê perwerde, tendûristî û xebatê de gelek xerab e.

# Şehîd Qazî û nevîyên wî



NURULLAH MÎRZA



**MIJARA** Komara Mahabadê û şehîd Qazî Mihemed hema kurd tev kêm zêde dizanin. Kesên nizanin jî dikarin di Google da Qazî Mihemed binivîsin û mijara şehîd Qazî û Komara Mahabadê bixwînin. Mijara me ji çawa çêêbûna bûyerê zêdetir, me çi ji destana Şehîd Qazî fêm kir û me çi ders jê hildaye?

Ji bo xewna şehîd Qazî Mihemed pêdivî bi 4 tiştan heye:

Perwerdeya civakê

Rêberên mêrxas û zana

Bawerî û piştgiriya gel

Dostaniya dewlet û kesayetên girîng (Dîplomasîya navnetewî))

**Perwerdeya Civakê**

Şehîd Qazî ji bo avakirina Komara Mahabadê hewara xwe gihand tevahiya rewşenbîr, alim, serleşker û dildarên kurd li tevahiya perçeyên Kurdistanê. Ji ber vê mirov dikare bêje di pêşengiya şehîd de Komara Mahabadê ji aliyê kurdên çar perçeyan ve hatiye avakirin. Di nava daxwazên serokê Komara Mahabadê da ji Uris çapxane daxwazeke sereke bu. Ewî girîngiyek mezin dida perwerdeyê. Rojên piştî ragihandina serxwebûnê dest bi çapkirina pirtûkan hate kirin û bilez dest bi perwerdeya zarokan kirin. Kovar ji bo jinan û ji bo gel hatin çapkirin. Xebatên ku Komara Mahabadê di tinebunê de dikir, bawer bikin îro di vî hebûnê de kurd nakin. Wesiyeta şehîd Qazî Mihemed ji bo perwerdeyê ti caran ji bir nekin.

Şehîd Qazî Mihemed dibêje, "Ji bona ku dijminê we nikaribe we bixapîne asta perwerdeya xwe bilind bikin. Ger perwerdeya we baş be, li hemberî dijminê xwe hûn bi ser dikevin."

**Rêberên mêrxas û zana**

Xweda û tevahiya cîhanê jî dizane ku şehîd Qazî wateya mêrxasiyê kir Qazî Mihemed. Di mijara mêrxasiya şehîd da ti şik û guman tüne ye. Ji ber vê yekê kurd bi qehremaniya şehîd serfiraz in. Dikarin qehremaniya kalikê xwe yê şehîd Qazî wek destanekê li cîhanê belav bikin. Di mijara zanabûnê de jî heman tiştê em dikarin bêjin. Rêber şehîd herçiqas wek bi eceman hatibe xapandin bê xuyakirin jî, mebesta wî ew bû ku Kurdistan jî wek komara azeriyan neyê talankirin û sivîl neyên kuştin. Ji ber nezaniya serok hoz û xîyanetan ew mecburî vê yekê bu. Canê xwe kir mertal û da ber sivîlan ku ecemên zalim zirar negihînin wan. Tiştek girîng jî ew e ku şehîd têkiliyên baş bi azeriyan re danîbû. Çunkî dijminê kurd û azeriyan yek bûn. Ragihandina Komara Mahabadê tenê çend roj piştî ragihandina Kkomara azeriyan bû ji bo bala Farisan tev nekeve ser kurdan an jî azeriyan. Têkiliya kurd û azeriyan îro jî ji bo kurdan pêwist e. Girîngiya têkiliya kurdan û neteweyên din ku rewşa wan wekê ya kurdan e îro bêhtir divê were nîqaşkirin. Bi mixabinî em bêjin ku kêmasiya Komara Mahabadê ew bû ku hêviyên xwe bi dewletekê tenê ve girêda. Ew jî bû sebeba rûxandina komarê. Gelo ev şaşî îro derman bûye? Em dikarin bejin spas ji Xwedê re ev derman bûye. Têkiliyên kurdan ligel tevahiya dewletên mezin hene. Di dawîya mijara rêbertiyê da em dikarin bêjin ku şehîd Qazî 50 sal li pêşiya kurdan bû ji ber wê kurd qedrê wî nezanîn. Hêvîdar im ku kurd îro qedrê Qazî Mihemmed û rêberên xwe bizanin ku nebin pezên guran xwarî.

**Bawerî û piştgiriya gel**

Di dîrokê de qasî kurdan ti netew ji hev kovî nayê dîtin. Di têkçûna Komara Mahabadê de ji sebebên sereke yek jî serokên hozên kurd ji aliyê dijmin va hatin xapandin û Komara Mahabadê bê xwedî hiştin. Ev ji kuştina dijmin jî zêdetir mirov diêşîne. Di dîroka kurdan da ev bûyer zêde dubare bûye û hê jî dibe. Mixabin netewa kurd hê jî dermanê vî derdî neditiye. Di van 20 salê paşî de ji bona saxkirina vî derdî hêviyên me zêde bûne. Bêhtir li Başûr û Rojhilat hinekî jî li Bakur û Rojava ber bi netewebûnê va gav hatine avêtin. Hêvîdar im ku bêhtir pêşketin hebe di mijara netewebunê de. Şehîd Qazî Mihemed bi dilek şikestî lê bi hêvî li ser mijara hevgirtina netewa kurd van wesiyetan dike:

"Birayên min êdî bi dijmin nexapin. Dijminê we ji kîjan neteweyê dibe bila be, dîsa dijmin e. We bi hev didin kuştin û kesên ji we man jî ew dikujin. Ti cara ew sozê xwe nayînin cîh. Bi sozên wan jî, bi sondxwarina wan jî bawer nebin. Ji bona Xwedê hev bigrin û hev biparêzin. Bawer bikin ku birayên we yên nebaş jî ji dijminên we yên kîndar baştir in."



Şehîd Qazî Mihemed dibêje, "Ji bona ku dijminê we nikaribe we bixapîne asta perwerdeya xwe bilind bikin. Ger perwerdeya we baş be, li hemberî dijminê xwe hûn bi ser dikevin."

Li gor van wesiyetan divê neviyên şehîd Qazî di çi rewşê de dibe jî, pişta hev bernedin. Ji bo netewa kurd yekem girîngî azadîya welatê wî ye. Ji bo vê, rêberên kurd divê gelê xwe bixwe bidin bawerkirin û gel jî ligel kêmasiyên serok û rêberên xwe jî ti caran lê ti caran dev ji piştgiriya wan bernedin. Dînê dijmin jî tüne ye, edaleta wî jî. Piştgiriya Mele Mistefa Barzanî bila ji her kurdek re bibe mînak û gotina dawî ya vê mijarê jî dîsa reberê nemir Qazî Mihemmed dibêje: "Ger dijmin hingiv jî bide we, bizanin di nav de jehr heye."

**Piştgirîya dewlet û kesayetên girîng (Diplomasiya navnetewî)**

Ji kêmasiyên sereke yek jî têkiliya kurdan ya bi dewlet û kesayetên girîng re ye. Netewek ku dixwaze bibe xwediyê dewletek, divê têkiliyên xurt bi dewlet û kesayetan re çê bike. Ev tiştek wusa ye ku nebe nabe. Dewletên cîran an jî dagirker ne mumkin e ku xêrê ji kurdan re bixwazin. Çunkî jixwe sebebe bêdewletbûna kurdan bi xwe ne. Şehîd Qazî Mihemed tiştê ku ji deste wî hatine kiriye. Têkiliyên baş bi Sovyeta Uris re çê kiriye. Têkiliyên herêmî jî bi azeriyan re daniye. Li ser xîmê ku rêberê mezin Qazî daniye, divê em bêhtir danûstandinên xwe bi neteweyên cîhanê re pêş ve bibin.

Ji bona dawiya vî nivîsê em dubare bikin ku her kurdek neviyê şehîd Qazî Mihemed wesîyeta wî bi mala xwe d li ber Ala Kurdistanê daliqîne û minnetdariya xwe ji vî kesê qedirbilind re bîne ziman.

Şehîd Qazî dibeje: "Wekê netewên qehreman ji bo rizgarbûna ji zilm û zordariyê bê navber bixebitin. Malê dinyayê ne girîng e. Ger welatê we hebe, ew dem her tiştê we jî heye, azadiya we jî."



EKREM ÖNEN

## Alfaba pêşin a kurdî latînî û rastiya dîrokî

Dîrok li ser asasê bûyer, fakta û dokumentan tê nivîsandin. Dema mirov li dîroka alfaba latînî kurdî dinere mirov dikare bêje ji nîvê sedsala XX. de gelek ronakbîrên kurd û rojhilatnasê xerîb bi vê pirsa alfaba kurdî latînî mijûl bûne. Di munaqeşeyên wan de, mirov dibîne ku encamek derdikeve ortê ku "alfaba erebî ne li gor zimanê kurdî ye, alfaba latînî bêhtir li ziman û dengên kurdî tên."

Bi ya min ev hinek cihê munaqeşê ye lê pirsa me di vê nivîsê de ne ev e. Jixwe li cîhanê çend alfabe hene, hinek ji wan wek alfaba latinî, erebî, kirîlî, aerograf ûhw. Her milletek ji xwe re yek ji vana hilbijartine, ewê ku herfê wan li dengên zimanê wan tê. Pirsa zimanê kurdî û edebiyata kurdî di nîvê sedsala XX. de li Akademiya Zanistî a Rûsya qeyserî tê rojevê, bi vî karî rojhilatnas û kurdologên wek Aleksander Jaba û paşê jî Hovsep Orbelî û gelekên din mijûl dibin. Ji ber wê jî em dizanin Aleksander Jaba tê li Erzirûmê wek konsûlê Rusya Qeyserî kar dike, li ber destê min ji arşîvên Aleksander Jaba pirtûka bi navê Xeberdana Zimanê Kurmancî ku di sala 1864an de amade bûye û di sala 1868an de Jaba ji tîpên erebî transkrîpsiya latînî kiriye heye, gelek balkêş e. Paşê Hovsep Orbelî jî tê li Muksê demeke dirêj dimîne, lêkolînê li ser zimanê kurdî dike û ferhengek bi navê Ferhenga Kurdiya Muksê amade dike.

Şerê Cîhanê yê Yekemîn û Şoreşa Oktober bû sebeb ku ev kar demekê rawestiya, paşê piştî sala 1917an Şoreşa Oktober ev xebat ji nû de li Sovyetê dest pê kir. Piştî ku li Sovyetê mafên millî, kultûrî ji bo milletan hat dayîn kurd jî wek her milletekî Sovyetê eqeliyet hinek mafê netewî û kultûrî wergirtin. Li ser vêya ji bo li dibistanan perwerda bi zimanê kurdî xebata amadekirina alfabeyek li dengên kurdî bê hate destpêkirin. Ji bo vî karî gelek rewşenbîr û rojhilatnasên kurd û Sovyetî li ser alfabeyên cuda cuda dest bi xebatê kirin, piştî xebateke dûr û dirêj di warê lingiustîk de a ku Erebê Şemo û Îshak Moragûlov dikir giha encamek dawî û alfabeyek latînî ku hemû dengên kurdî tê de hene hazir kirin û pêşkeşî dezgehên Sovyetî ên resmî kirin û di sala 1928an de alfaba latînî kurdî a ku Erbê Şemo û Îshak Moragûlov amade kiribûn ji alî dezgehê Sovyetî hate pejirandin.

Di sala 1929an de pirtûka pêşin a bi navê ''Xo Xo hînbûna xwendina nivîsara Kurmancî" bi vê alfabê li Rewanê tê çapkirin, piştî demekê ku biryara weşana rojnameyek kurdî ji alî dezgehên Sovyetî tê girtin û di 26 adara sala 1930an de heta sala 1937an rojnameya xwediyê dîroka herî dirêj a kurdî Rêya Taze bi vê alfabeya latînî dest bi weşanê dike, di sala 1930an de li Rewanê beşê pedagojiyê pişt Kafkasyayê ji bo amadekirina mamosteyên kurdî hate damezirandin. Her weha li tevaya dibistanên kurdên Sovyetê perwerdeya zarokên kurdan bi vê alfaba latînî dihate kirin, zêdeyî 100 pirtûk bi vê alfabê hate çapkirin.

Piştî vê alfabeya Erebê Şemo û Îshak Moragûlov bi 4 salan Rehmetiyê Celadet Bedirxan di sala 1932an de di Hawarê de alfaba latînî kurdî ku amade kiriye belav dike. Ez nizanim Celadet Bedirxan haya wî ji alfabeya Erebê Şemo û Îshak Moragûlov hebû an na? Bes hinek fakta li cem min hene ku ihtîmala pir xurt haya Celadet Bedirxan ji xebatên kurdên Sovyetê hebû. Ezê li jêr behsa van faktan bikim. Di sala 1984an de ez ji Mosko tatîla havînê bi mêvantî çûm Rewanê. Di mêvantiya xwe ya Rewanê de ez li gel kak Tîmûrê Xelîl û kak Tosinê Reşîd (ku zavayê Heciyê Cindî ye) em çûn serdana Heciyê Cindî. Mamoste Hecî hezar rehm li gora wî be, em bi qedrekî bilind pêşwazî kirin. Me hinekî behsa Romê kir, paşê em hatin hinek li ser xebata kurdên Sovyetê û karê wan. Di nav sohbetê de Mamoste Hecî behsa têkiliyên xwe bi Celadet re kir ku çawa wî namê û Riya Taze û hinek pirtûkên ku kurdên Sovyetê çap kiribûn ji Celadet re rê kiriye û dewam kir got, "dema di serdema Stalîn de ez hatim girtin di tekqîqa min de yek ji gunehbariya min ew bû ku têkiliyên min bi kesên derveyî Sovyetê re heye, bi wê dihatime gunehbarkirin. Ev tiştên ku rehmetiyê Heciyê Cindî ji min re bi xwe got û nivîsa Celadet Bedirxan di hejmara 8an a Hawarê de a bi navê Herekol Ezîzan ku behsa Rêya Taze dike, behsa kar û xebatên kurdên Sovyetê dike ku dibê me hinek pirtûk û rojnameya Rêya Taze ji wan wergirtine, her weha pesnê wan dide, lê behsa alfabê di nivîsê de nîne. Ev faktanê li jor min behs kir, ji me re dide rêdan ku haya rehmetiyê Celadet ji kar û xebatên kurdên Sovyetê hebûye.

Her weha li vir dixwazim tiştekî girîng bêjim ku bi pirsa alfabeya kurdî re her weha du rewşenbîrên kurd ên hêja Tewfîk Wehbî beg û Gîv Mukriyanî jî mijûl bûne. Ev tiştên ku li jor min behs kirin ji bo rastnivîsa dîroka kurdan li ser asasê fak, bûyer û dokumentan bê nivîsandin girîng e. Ji van fakta û dokument û bûyerên li jor hatine behskirin tiştên heta niha li ber destan hene em dikarin bêjin alfabeya kurdî latînî ya pêşin, alfabeya Erebê Şemo û Îshak Moragûlov e. Heger sibehê em bigihên hinek dokûmenten din ku hîn ne diyar e, em dikarin ji nû de li ber çav de derbas bikin.

Di pirsa nivîsa dîroka kurdan de, ne lazim e her yek ji me dokumentekê bibîne û bes li ser asasê wê dokumentê tenê tiştan mutleq bike. Ji ber di derbarê dîroka kurdan de gelek dokumentên nû dertên ku gelek caran dibin sebebên ew tiştên berê ku mutleq hatine kirin di ber çav re derbas bikin. Ev pirsa ku li jor min behs kir, bes min behsa aliyên dîrokî kir ku ji xwendevanan re rastiya dîrokê eşkere bibe. Aliyê lingiustîk ew karê zimanzana ye. Jixwe xwedê qewetê bide di pêş de dixwazim li ser kar û xebatên kurdên Sovyetê yên wek Qanatê Kurdo, Erebê Şemo, Heciyê Cindî, Xelîlê Çeçan, Casimê Celîl, Keremê Reş, Şakirê Xudo, Emînê Evdal, Eliyê Evdirehman, Şamil Askerov, Mîroyê Esed û gelekên din binivîsim. Karê gelek hêja kirine. Gelek ji wan şexsî ji nêz de nas dikim ku dostên min ên nêzîk bûn, gelek jî ji kar û xebatên wan haydar im.

## Kerkûk û Ala Kurdistanê

# Nerînên sîyasetvan û rewşenbîrên Bakurê Kurdistanê




BENGÎ BAWEŞAN

MECLÎSA Parêzgeha Kerkûkê biryarek girt û wê edî Ala Kurdistanê li Kerkûkê bi aweyekî fermî bê daliqandin. Bi wê biryarê, bilindkirina Ala Kurdistanê kete rojevê.

Di 28ê adarê de Meclîsa Parêzgeha Kerkûkê biryar da ku wê êdî Ala Kurdistanê li saziyên fermî yên Kerkûkê bê daliqandin. Heman demê Ala Kurdistanê li Kerkûkê hat daliqandin. Ji aliyê kurdan ve ev yek bi awayekî dilxweşî hat pêşwazîkirin lê belê bo bilindkirina alê hin aliya nerazîbûnên xwe nîşan dan.

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî derheqê bilindkirina Ala Kurdistanê de daxuyaniyek da û got; "Biryara Meclîsa Kerkûkê li gor qanûna ye. Çawa Ala Kurdistanê û Peşmerge li dijî erişên terorî Kerkûkê parastin, divê bi heman şiklî li Kerkûkê biratî û jiyana hevpar jî biparêze."

Heftenameya Basê derheqe bilindkirina Ala Kurdistanê de bi akademîsyen, rojnameger û parêzvanên kurd re axivî.


Abdullah Kıran | Ahmet Özmen | Celal Baykara | Mahmud Bozarslan | Noşirvan Elçî

**Abdullah Kıran: Daliqandina Ala Kurdistanê dereng ma!**

Akademîsyenê Zanîngeha Mûşê Abdullah Kıran amaje kir "Piştî ku di sala 2014an de DAİŞ êriş kir û hezên arteşa Iraqê jî ji Kerkûkê vekişiyan wê wextê çawa Ala Kurdistanê li deveren din hat daliqandin divê li Kerkûkê jî bihata daliqandin, bi ya min ji ber vê sedemê daliqandina Ala Kurdistanê dereng mabû."

Kıran wiha pê de çû: "Ev mafê kurdan e! Di qanûna bingehîn ya Iraqê de jî ev yek heye. Îro yên ku li hember vê yekê derdikevin, heke hinek xwedî exlaq û wijdan bûna heta dawiya 2007an ev mesele bi referandûmê wê bihata kifşkirin. Hikûmeta Malîkî, Îbadî dest neavêtin vê meseleyê. Her gav xwestin ku vê meseleyê taloq bikin! Îcar ev referandûm pêk nehat. Ji ber vê divê îro ne bilindkirina Ala Kurdistanê, çima heta niha referandûmek pêk nehatiye bê rexnekirin."

Abdullah Kıran destnîşan dike ku di mijara alê de tevliheviyek heye û dibêje ev al ne tenê ala kurdan e ala hemû gelên Kurdistanê ye, al nîşaneya welatan e. Kıran; "Divê kurd, di meseleya alê de tawîzê nedin. Ala a her kesî heye, îro alên cihên xweser jî hene. Niha li wir dewleteke fedarel heye, li gorî hiqûqa federalizmê, her dewletên federal xwedî heman mafê ne. Divê her dewlet rêzê nîşanî ve yekê bidin."

Kıran bo bertekên tirkmenên Kerkûkê jî dibêje, 'Heke tirkmenan baş bidîtana, meseleya kurdên Iraqê heta niha çareser dibû lê bo Kerkûkê milyonek kurd canê xwe feda kirine' û wiha domand; "Îro bi saya xwîna kurdan tirkmen li malên xwe rehet rûdînin. Zimanên wan jî fermî ye..."

Akademîsyen Kıran diyar dike ku 'Kerkûk bo kurdan bajarekî gelek girîng e. Kerkûk bo hin aliyan li ser deryaya neftê rûniştiye lê bo kurdan Kerkûk li ser deryaya xwîna kurdan rûniştiye' Kıran; "Heke kurd Helebçeyê dîtibin, Enfal hatibe serê wan dê meriv bizanibe ku bo kurdan Kerkûk tê çi maneyê. Ji bilî vê yekê Kerkûk bo kurdan tê maneya sîgorteya serxwebûnê. Dewletek bixwaze serxwebûnê îlan bike divê şert û mercên aboriyê baş pêk bîne. Sîgorteya serxwebûna kurdan nefta Kerkûkê ye."

**Mahmud Bozarslan: Bajarê Kerkûkê bo kurdan sembola têkoşîna dîrokî ye!**

Rojnameger Mahmud Bozarslan jî diyar dike ku biryara parêzgeha Kerkûkê, biryara xelkê Kerkûkê ye, divê her kes rêzê nîşanî vê biryarê bide.

Bozarslan dibêje bajarê Kerkûk bo kurdan ji her aliyê ve girîng e û wiha berdewam dike;

"Ji bo kurdan ev bajar, bajarekî sembolîk e. Sembola têkoşîna kurdan ya dîrokî ye. Armanca kurdan a ewil Kerkûk bû. Mele Mistefa Barzanî pir caran aniye zimên û gotiye ku 'ez dev ji Kerkûkê bernadim.' Di têkoşîna kurdên Iraqê de Kerkûk cihekî girîng digire . Ji aliyê aboriyê ve jî ev bajar girîng e. Lê piştî demekê herêma Kurdistanê statûya xwe bi dest xist, li gelek deverên Kurdistane neft derxist. Ji ber vê sedemê jî di wan salên dawîn de maneya Kerkûkê ya dîrokî zêdetir derket pêş."

Rojnameger Bozarslan balê dikişîne ser bertekên bo bilindkirina Ala Kurdistanê û dibêje, 'Ez hêvî dikim ku ev biryar di nav xelkê Kerkûkê de nebe sedema pirsgirêkên nû. Em dizanin ku li Tirkiyeyê hin alî ji vê biryarê aciz in û rave dikin ku wê alozî derkeve.'

Bozarslan dibêje, "Ji aliyê din ve bi qasî ku dizanim endamên wekî ereb û tirkmen tevlî vê biryarê nebûne lê ji xelkê ji bilî bertekên hin aliyan, gengeşiyek mezin çênebû." Her wiha Bozarslan dest nîşan dike, 'Serokwezîrê Iraqê Haydar El Îbadî jî bang li dewletên din ên ereb kir lê ji van dewletan jî deng derneket, ev jî tê vê mane yê ku rêzê nîşanê vê biryarê didin' û axaftina xwe wisa domand; "Ev mesele ji provakosyanê re vekiriye. Li ser navê kurdan, tirkmenan, ereban texmîn nakim wê aloziyên mezin çêbin. Lê wê bertekên piçûk çêbin. Endamên meclisa parêzgaha Kerkûkê ez bawerim ger ev biryar bûba sedemê aloziyekê dê vê biryarê negirtana."

**Noşirvan Elçî: Divê herkes hurmetê nîşanî biryara Meclisa Kerkûkê bide**

Serokê Baroya Şirnexê Noşirvan Elçî amaje dike divê herkes hurmetê nîşanî biryara Meclisa Kerkûkê bide. Çawa bo her miletî ala wan bi qîmet e divê hurmetê nîşanî alên miletên din jî bidin. Elçî balê dikişîne ser têkiliya gelên Kerkûkê jî.

"Li gorî dîtina min di nav gelên Kerkûkê de gengeşî çênabe. Kurd, ereb, tirkmen wek xwîşk û bira dijîn, Kerkûk bajarê biratiyê ye. Heta niha gengeşiyek mezin çênebûye. Lê ku tu kes mudaxilî vê yekê nebe, alozî çênabe. Bila gel biratiya xwe bidomînin. Daliqandina Ala Kurdistanê bo gengeşiyê nehatiye bilindkirin."

Parêzer Elçî diyar kir Kerkûk ji gelek aliyan ve bo kurdan bi mane ye! Li vî bajarî gelên wekî ereb, tirkmen dibe ku gelên din jî hebin, divê ew jî bi awayekî hevûdu be. Lê belê divê herkes qebûl bike ku Kerkûk bajarê kurdan e.

Elçî, piştî bilindkirina Ala Kurdistanê bo têkiliya Bexda û Hewlerê jî wiha axivî;

"Ji xwe Bexdayê rewşa Kerkûkê qebûl kiriye. Di vê mijarê de tu pirsgirêk tune ye. Bexda jî û aliyên din jî mudaxilî vê biryarê nebin bi ya min rageşî çênabe. Divê kurd jî aqlê selîm tevbigerin. Şerê li wê derê bo tu kesî fêdeyek çênake..."

**Ahmet Özmen: Daliqandina Ala Kurdistanê nayê maneya înkara neteweyên din**

Serokê Baroya Amedê Ahmet Özmen jî diyar dike piştî ku qanûna bingehîn a Iraqê çêbû, Iraq li ser sê herêman ava bû. Yek jî Herêma Kurdistanê ye. Li gorî qanûna bingehîn a Iraqê statûya fermî ya Kurdistanê heye. Serok û ala wê jî hene.

Dîsa Özmen dest nîşan dike ku li Kurdistanê ji bilî kurdan neteweyên din jî hene. Ev netew him li parlamentoya herêma Kurdistanê him jî bi awayekî din têne temsîlkirin û Özmen;

"Piştî ku Ala Kurdistanê hat daliqandin hin bertek çêbûn. Rakirina alê ne ji bo înkarkirina wan miletên din e. Neteweyên din yên Kerkûkê tevî hebûn, çand û zimanê xwe wê bidomînin. Çimkî deh salên derbasbûyî mînak e bo vê rewşê. Li parlamentoya Kurdistanê gelek partî hene. Her wisa temsîliyeta nasnameyên olî û yên nijadî jî li parlamentoyê berbiçav e. Nîqaş û pevçûnên ji ber alayê ne fêde dide Herêma Kurdistanê, ne li Iraqê ne jî Rojhilata Navîn... Hêviya min ev e ku bi riya diyalog û muzakareyê ev yek bê çareserkirin."

Özmen jî balê dikişîne ser referandûma Kerkûkê û dibêje heta niha divê bo rewş û pêşeroja Kerkûkê referandûm bihata kirin û wiha didomîne; "Ev referandûm pêk bihata, Kerkûk daxilî kîjan herêma Iraqê biba dê derketa holê. Referandûm divê demildest bê kirin, wê demê ev nîqaş jî wê ji holê rabe..."

Serokê Baroya Amedê Özmen bo nîqaşên bajarê Kerkûkê jî dibêje kurd Kerkûkê wekî bajarê xwe dihesibînin û serjimara kurdan li wir zêde ye. Li wî bajarî ji bilî kurdan netewên din jî hene û ew jî dibêjin Kerkûk ya me ye. Helbet ev mijareke dîrokî ye. Fikr û ramanên akademîsyen û dîroknasan li ser vê mijarê girîng in.

**Celal Baykara: Kerkûk ji berê ve bajarê kurdan e**

Parêzer Celal Baykara jî rave dike ku nîqaşên li ser bajarê Kerkûkê yên wek 'Kerkûk ya kê ye' bi ya min ji kurdan re neheqiya herî mezin e! Kerkûk ji berê ve bajarê kurdan e. Di dema Seddam de gelek kurdên Kerkûkê sirgûnî cihên din kirin û xwestin li ser demografiya kurdan ê Kerkûkê guhertinan çêbikin. Lê piştî demekê kurd vegeriyan cihê xwe dibêje û wiha axaftina xwe didomîne;

"Meclisa Kerkûke, mecliseke hiqûqî him jî meşrû ye. Bi ya min tevî biryareke dereng be jî daliqandina Ala Kurdistanê dîsa jî ez vê biryarê erenî dibînim. Dibe ku ez hinekî hestiyar tevdigerim wisa difirim an jî dixwazim; biryara Meclisa Kerkûkê bibe destpêka referandûm û serxwebûna kurdan..."

Baykara bo têkiliyên Bexda û Hewlerê jî diyar dike ku kurd kîjan gavê biavêjin, çi bikin jî li herêmê li ser kurdan wê zordarî her hebe; "Li derdora kurdan dewletên ku xêra kurdan naxwazin hene. Kurd bi awayekî dostanê nikarin ji dewletên ku pêve girêdayî ne biqetin. Veqetîna kurdan dostane nabe" dibêje.

Parêzer Celal Baykara bal dikişîne û dibêje ku 'reveberiyên kurdan li Rojhilata Navîn xweyî pergalên hevpar, demokratîk in. Heman demê vê yekê pêk jî tînin. Parlamentoya Kurdistanê a bi partî û rengên xwe yê cur bi cur bo vê yekê mînakeke serkeftî ye.





# Herêma Kurdistanê
# Aborî û hilberîn geş dibe

■ ŞOREŞ SERBEST

Piştî şoreşa Gulanê û rûxandina rejîma Seddam, Herêma Kurdistanê di warê aborî de bû navendeke girîng a Rojhilata Navîn. Herçend şerê DAIŞê û daketina buhayê neftê rê li ber wê pêşketinê girtibe jî tê çaverêkirin ku bazara aborî ya Herêma Kurdistanê dîsa geş bibe.

Li Herêma Kurdistanê di sala 1991ê de, bi şoreşa gel re, rejîma xwînrêj ji axa Kurdistanê hate avêtin û Kurdistaniyan hewl da desthilateke demokrat û lîberal ava bikin. Dema ku kurd li Başûr bûn desthilat, li Başûrê Kurdistanê bi navê hilberînê ti tişt tune bû. Çandinî dihate kirin lê ew jî ne bi şêwaz û rêyên modern bû. Gundiyan bêyî amûrên pêşketî û teknîkên nû çandiniya xwe dikir.

Heta sala 2005an, ambargoya navdewletî li ser Iraqê hebû. Rêveberiya xwînrêj a Iraqê jî ambargo danîbû ser Herêma Kurdistanê. Ango Kurdistan di bin du ambargoyan de bû. Di heman demê de, dewletên cîran jî beşeke Kurdistanê dagir kiribû û bi destwerdanên siyasî û ambargoyên taybet Başûr dorpêç kiribû.

Mixabin ligel van hemû egerên neyênî, li Başûr şerê navxweyî dest pê kir. Ev eger, li parçeyê azad, bûn rêgirên mezin li ber avadankirin û geşedana aborî.

Lê piştî destwerdana leşkerî ya Amerîkayê ya li dijî Bexdayê (2003) û hilweşandina rejîma xwînrêj bi du salan, ambargoyên li ser Iraqê û Başûrê Kurdistanê jî rabûn. Piştre derî vebûn û Başûrê Kurdistanê êdî karîbû pêwendiyên civakî û aborî bi cîhanê re deyne.

Rêveberiya Başûrê Kurdistanê, demildest projeyên avadankirin û pêşxistina aborî amade kirin û dest bi xebatan kirin. Bêguman di destpêkê de hemû hewl ew bû ku bajarên xweş werin avakirin.

Li hemû cîhanê niqaşek heye: gelo bi tenê dirav têra avadankirinê dike? Ango heke perê xelkê çebibe, dahata wî zêde bibe û bazirganî bipêşkeve; ev tê wê wateyê ku ew welat hatiye avadankirin? Beşeke zêde ji avadankirinê wê fam dike ku heke avahiyên bilind, tirimpêlen baş, rêyên xweş û dahateka baş hebe, ew welat avadankirî ye. Nexêr, ev ne rast e. Ji ber ku tenê dirav nikare welatekî ava bike. Pêwîst e, bi pêşketina aborî re; di warê rewşenbîrî, çandî, hunerî, perwerdehî û azadiya takekesî de jî pêşketin hebin ku em bikaribin bibêjin, ev welatekî avadankirî ye.

Dema em qala civakekê bikin ku bi pîşesaziyê hunandiye, pêwîst e em pêşketina asta çandî ya civakê wek pîvana avadankirinê bihesibînin.

**Serdema bazirganî û veberhênanê**

Li Başûrê Kurdistanê di serî de bazirganiyê dest pê kir. Wê demê projeyên hilberînê bi tenê avadanî, çekirina rêyan û piran û danîna jêrxana bajaran bûn. Ji ber ku rejîma dagirker bi ti awayî, ti kar li Kurdistanê nekiribû. Bi tenê hin rê çêkiribûn ku bikarin debab û çekên xwe yên giran bînin Kurdistanê.

Bi pêşketina bazirganî û bi piştgiriya rêveberiya Kurdistanê re, bazirganan hedî hêdî berê xwe da hilberînê û li Kurdistanê kargeh (fabrîka) hatin avakirin. Rêveberiya Kurdistanê bi rêya Wezareta Pîşesazî û Bazirganî û Desteya Weberhênanê kar dike ku piştgiriya karsazan bike.

Wezareta Pîşesazî û Bazirganiyê, krediyê dide her karsazê ku kargeheke pîşesaziyê ava dike. Wezaret bi qasî ji %40-70yê buhayê mekîneyên kargehan, krediya bêfaiz dide karsazan. Desteya Weberhênanê, projeyên di warê perwerdehî, tûrîzm, niştecîkirin, kargeh û çandiniyê de jî destek dike; li gor pêwistiyên wê deverê û li gor yasayan erd dide xwediyên projeyan. Piştî proje xelas dibe tapoya erd jî dide şîrketan.

Rêveberî ji bo geşedana çandiniyê jî erd dide cotkaran û piştgiriya wan dike. Herwiha hewl dide ku bi rêya gumrikên Kurdistanê berhemên navxweyî biparêze. Dema berhemên navxweyî yên Kurdistanê tên bazarê, baca gumrikê ya wan berheman têne zêdekirin.

Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji bo geşedana aborî û pêşketinên perwerdehî û çandî jî hin proje çêkirine ku encamine baş didin. Bo nimûne, xwendekaran li ser hesabê hikûmetê dişînin welatên Ewropa. Bi peymanan, pêwendiyên zanîngehên Başûr bi zanîngehên cîhanê re çê dikin, bi mebesta alugorkirina zanistê. Herwiha hewl dide ku dibistan û zanîngehên cihanî werin li Kurdistanê dibistanên taybet vekin ku bi vî rengî ezmûna wan dezgehan vediguheze welêt. Festîvalên navneteweyî yên sînema, şano û çavkaniyên mirovî saz dike û hewl dide ku bi aboriyê re herweha civak jî bi pêş bikeve.

Îro li Başûrê Kurdistanê, kargehên baş hatine avakirin: kargehên mast û şîr, geç (cils), çimento, boyax, rûnê makîneyan, rûnê xwarinê, şîş, birinc, plastîk, elemînyûm, mobîlya hin ji wan in.

Lê em nikarin bibêjin ku kargehên heyî di wê astê de ne ku têra bazara navxweyî ya Kurdistanê bikin. Hê jî pêdivî bi derveyê welat heye. Bêguman dema ku me got têra bazarê nake, ev jî heye ku beşek ji berhemên li welat tên hilberîn diçe nav Iraqê û li bazara Iraqê tê firotin.

Li Kurdistanê tenê hawirde (îthalat) nayê kirin. Bêguman hinek şirket hene ku hinardeyê (îxracat) dikin. Bo nimûne, hin berhemên çandinîyê û hingiv têne hinartin. Li Başûr 15 şirketên hinartinê hene. Lê li vir pêwîst e em tiştekî bêjin ku îdareya Herêma Kurdistanê di nav xeletiyeke mezin de ye. Ji ber ku ew baca gumrikê ji şirketên hinartinê distîne û ev jî dibe sedem ku hinartin li Kurdistanê lawaztir be.

Pêwîst e hikûmet hewl bide hilberînê zêde bike û ji bo ku mezin bibin bacê ji ser wan şirketan rake ku hinardeyê dikin.

**Şerê DAIŞê bû sedema qeyraneke darayî**

Wekî tê zanîn, aboriya Başûrê Kurdistanê xwe li ser firotina petrolê ava kiriye. Bi ketina buhayê petrolê re, li welêt qeyraneke mezin rû da û ev qeyran hê jî berdewam e. Bêguman sedema qeyranê ne tenê ketina buhayê petrolê ye. Sedemek jî ew e ku di 2014an de Mûsil kete destê rêxistina terorîstî DAIŞê û Başûrê Kurdistanê ev çend sal e ketiye nav şerekî mezin. Ev şer, bandora xwe zêde ye li ser aboriyê. Ji du aliyan ve bandorê dike: ji aliyekî ve, ev şerê dirêj û giran xisareke mezin a maddî bi xwe re tîne û herwiha dema welatek di nav metirsî û şer de be, sermayedar ji wî welatî direvin. Geştiyar nayên wî welatî. Vî şerî bandoreke mezin li ser sektora geştiyariyê kir. Salê bi milyonan geştiyar dihatin Başûrê Kurdistanê lê aniha ev hejmar gelekî kêm bûye: ji ber metirsiya şer ti kes nayê. Wekî din jî geştiyarê herî zêde erebên Iraqê bûn ku aniha ji ber ewlehiyê, asayişa Kurdistanê kêm caran dihêlê geştiyarên Iraqê werin Kurdistanê.

Berî sala 2014an geşedanên mezin ên aborî li Kurdistanê hebûn lê aniha em dikarin bêjin ku ev geşedan %70 kêm bûye.

**Divê alternatîfên neftê hebin**

Daketina buhayê petrol û neftê careke dî nişan da ku pêwîst e abôrî ne li ser petrole lê li ser pîşesazî, çandinî û geştiyariyê be. Da ku dema buhayê petrolê kêm bibe yan jî Bexda butçeya Başûrê Kurdistanê bibire, hikûmet nekeve wê rewşê ku nikaribe mûçe û meaşên fermanberên xwe bide.

Piştî van zanyariyan em dikarin bêjin ku pêşketin û avadankirina welat, ne di asta pêwîst de ye û hewce ye karên baştir werin kirin. Rast e ku Başûrê Kurdistanê ji sala 1991ê ve azad e, lê rabûna ambargoyan piştî 2003yan bû û dema em aboriya Başûr binirxînin divê em vê agehiyê ji bîr nekin. Gava welatek ji hemû aliyan ve hatibe piştguhkirin: pêşxistin û avadankirina wî welatî ne tiştekî asan e. Lê em baş zanin ku ev şert û mercên hanê, nikarê kêmasiyên me veşêrin. Mînaka herî hêsan ew e ku, hê jî rêveberiya herêmê nikarê 24 demjimêran cereyanê bide hemwelatî û kargehan. Baş e heke cereyan nebe kargeh dê çawa werin avakirin? Yek rê heye, ew jî divê karsaz jeneratoran bikirin. Ev jî tê wê maneyê ku karsaz têk biçin.

Başûr li ser rêyeke nû ye, hewce ye di warê pîşesazî, geştiyarî û çandî de xebateke baş bike û bîne wê astê ku hinartin zêde bibe. Da ku aborî ne giradayî petrolê be û bikare xwe xwedî bike. Pêşketinên ku em dibinin weha nîşan dide ku li welat hilberin hedî hêdî zêde dibe. Bi vî awayî barê giran dê nekeve ser desthilatê. Ji ber ku dema dahat bi tenê ji petrolê be xwedîkirina welatiyan li ser pişta rêveberiyê dimîne.



JAN DOST



## Vê romanê nexwînin!

Di van demên nêzîk de wê du romanên min belav bibin. Yek jê romana Kobanî ye, ya din jî Xwîna Serê Minarê ye. Kobanî ê li Bakur derkeve û bighê destê xwendevanên ku ev demek e çavên wan di rêya wê de zuha bûn.  Hinek problem û astengiyên weşangeriyê ew bi derengî xistin lê vaye her tişt safî bû û wê bi xêr bi awayekî rind û delal bikeve destê xwendevanan. Xwîna Serê Minarê jî, ku min ew bi erebî nivîsî bû û niha wergeriyaye kurdiya soranî, ê li Hewlêrê, li paytexta herêma Kurdistana azad ji weşanxaneya Malî Wefayî were belav kirin.

Tiştê ku bala min zêde kişand dema nûçeya herdu romanan belav bû ew e ku li rex pêşwaziya germ û bendewariyê ji hêla piraniya xwendevanan, hêrsek û dijmintiyek pêşinde li himberî herdu romanan hate diyar kirin ji hêla hin xwendevanên din.

Ji bo Kobanî camêrin hene dibêjin: “Ew kî ye romana Kobanî dinivîse? Bila behsa xiyaneta xwe bike, bila behsa revokiya xwe bike û filan û bêvan.“ Ji roja ku min ragihand ez ê romana bajarê xwe binivîsim min ev qijeqija kirêt bihîst, yanî ew cûre mexlûqatên xwedê teala naxwazin kesekî mîna min “xayin û revok, dûrî nirxên berxwedanê“ behsa êş û jana xwe bike, behsa bajarê xwe yê wêran û xelkên wî yên bi çolan ketî bike. Hela tu behskirina berxwedana keç û xortên kurd li dera hanê deyne ew ne ji mafê “xayinan“ e. Tenê kesên “bi namûs, bi rûmet“  ji heqê wan e pesnê xebatê û berxwedanê û lehengiyê bidin. Ji ber ku Berxwedan markayek e ku bi navên terefekî tenê hatiye tomarkirin. Mafê behskirina wê tenê di destê hêzekê de ye, kes nabe nêzîkî sînorên wê mijarê bibe ku izn û destûrê wernegire.

Ev reng reaksiyona dûrî mentiq û hişmendiyeke saxlem ku dixwaze devê nivîskarekî gem bike ji ber ku ne “endamê kerî ye“ bi awayekî ecêb sal bi sal berfirehtir dibe. Li tevaya Kurdistanê û di nav tevaya kurdên cîhanê de.

Mexlûqatên Xwedê teala ên behsbûyî, mejiyê ku xwedê di sindoqa qehfê wan de daniye bi kar naynin. Ji xwe belkî ew mejiyê logîk “mentiqî“ ku pîvana wî bi terazûya êqil e di wê sindoqê de nebe jî. Yek ji wan ranabe nabêje ka camêr û canikno hela bisekinin bila “xayinê me“ berhema xwe belav bike, em bixwînin, lê mêze bikin, ma  kî çi zane dibe ku tew tobe kiribe û hatibe ser “rêya me ya rast!“ û wî jî çend “herbijîkên xwe“ gotibin û îman bi rebbê Mûsayê me yê pîroz anîbe! Na, ew ê qet camêrek yan canikek ji nav wan dernekeve û wê wisa nebêje. Koro ye, bi yek dengî, yek rengî di yek govendê de dîlana derewan digerînin “ev şev û roj xeber û dijûnan ji pakrewanê me re dide“. Li hêla din jî, êrîşên li ser Xwîna Serê Minarê jî ne kêmî van in. Li başûrê welêt jî eynî mentelîte ye. Ew jî eynî mexlûqatên îdeolojîk in, mejiyê wan wek zenberekên seetên rojiya remezanê hatine girêdan, hem dibe wexta sihoran yan fitarê, te dît çirrînî jê hat: “Kitêbêk ke be riq û qînewe nûsrabêt û bîyewêt xebat û têkoşanî layenêk ke le lûtkey serkewtinda ye bişîwînêt şayenî xwêndinewe niye“. Evî mexlûqî jî ji Silêmaniyê peyama xwe weha gihande min. Ew dibêje ku, eger kitêbek bi rik û kîn hatibe nivîsîn û dixwaze xebat û têkoşîna hêzekê ku êdî serkeftina wê berz û bilind bûye şêlû û reş bike, ne hêjayî xwendinê ye!


Mirov bi dûrbîna siyaseteke partîyane dikare li rewşa welêt, li civakê, li hemû aliyên jiyanê binêre, lê ew dûrbîn ne zelal be qet dibe pîvan ji bo serkeftina berhemek wêjeyî? Na. Eger terazûya te ji edebiyatê re partîperestî yan oldarî be, tu yê rast nepîvî. Xumeynî  jî xwîna Selman Ruşdî hedir kir, here ji van mexlûqatan re bibêje, wê bersiva te weha bidin: Selman Ruşdî nivîskar e, azad e di berhema xwe de fikr û bîr û baweriyên xwe bibêje.

Lê Jan Dost! Na ew xayin e, gidî berhema wî a ku hîn derneketiye nexwînin, guhê xwe bigrin bila dengê wî neyê we, çavên xwe bigrin bila hûn tew berga pirtûka wî jî nebînin.

Li welatê min şer e, di vî şerî de ez wek romanivîsekî kurd î ji wê herêma lanetlêbariyayî qenc dizanim çi diqewime, ba ji kîjan alî hiltê û daran bi kîjan alî de xwar dike û davêje erdê, hayê min ji hûrgiliyên herî biçûk jî heye, ez dizanim kî dikuje, kî tê kuştin û tim jî ez bi xwîna kuştiyan re me bi taybetî wan qurbaniyên ku bi destê “biraderên“ xwe û bi kêra neyaran têne gurandin. Rastiyê dibêjim, ji dîrokê re dihêlim. Nikarim bêdeng bimînim. “Ê ma çima tu behsa filan û bêvan jî nakî?“

Min behsa wan jî kiriye mexlûqê ecêb! Lê te nexwendiye û nebihîstiye, ew ne gunehê min e. Ev yek, a din ez niha serê xwe bêtir bi rewşa „malbata“ xwe re diêşînim, karê min bi cîranan neketiye. Seydayê min î gewre Xanî, rexne li mîrê Bazîdê kir, serê xwe bi mîrê Behdînan û Soran û Erdelaniyan re neêşand.

# Totalîtaryanîzma PKK ji perspektîva Hannah Arendt



Rêber ligor boçûna totalîter statûya “nexetabarîya bêdawî” wergirtîye. Yanê rêber ilelebed bêxeta ye. Tenê yên ku gotinên wî şirove kiribin, xetabar in û jê fêm nekirine. Wisa jî, di kitêba rêxistinî ya Partiya Nasyonalsosyalîst a karkerî ya Almanyayê (Organisatonsbuch der NSDAP) rêza yekem de li ser erkên endaman dibêje: “(Der Führer hat immer recht), ango Fuhrer/lîder hertim rast e.

BEXTÎYAR HESENZADE

**NIVÎSA** liber destî hewlek e, ku ji perspektîva felsefî û civaknasîya Hannah Arendt, bîrmenda resencihû ya almanî, em çavekî bixişînin ser ketwarê rêxistinî û îdeolojîk ê Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK). Ya îronîk ew e, ku Hannah bixwe xwe wekî fîlosof nedida pênase kirin û tenanet dijî dîsîplîneka zanistî bi navê civaknasîyê bû, jiber ku ji ruwangeha wê ve, yên ku bi vê disîplînê ve mijûl in, heman endazyarên civakî ne, ku divên di arasteyên ku ew dixwazin, civakê bi rê ve bibin. Arendt çend eserên gring liser teorîyên siyasetê nivîsîne, ku ya herî bi nav û deng “Resenê Totalîtaryanîsmê” (The Origin of Totalitarianism) ye. Totalîtaryanîsm ji bidestxistina berjewendîyên kesî bêhtir têdikoşe rejîma îdeolojîyekê geşe bide. Di haletên wekî nazîsmê de, dogmayeka nijadperestane israrê liser serdestîya nijadê Aryan dike. Di Stalînîsmê de îdeolojîyek hewl dide kapîtalîzm û burjuwazîyê ji nav bibe. Lê ya muşterek jibo hemî lîderên totalîter ew e, ku ew îdeolojîyê bi ser hertiştî de dibînin, tenanet heger delîve û îmkanên netewe û gel bikevin bin metirsîyê. Herwiha “îdeolojîyên totalîtaryan bi dabeşkirina dinyayê biser du cemserên dijber dixebite, ji lewre her kes, her rêxistin û her alîyek dijî rêxistina totalîtaryan bisekine beşek ji komployên dijî wê rêxistinê ne.” (Arendt, 1951:367) Ev têbînî liser PKK bi sanahî dihête peyrew kirin, jiber ku di lîteratura PKK de herdem behsê komployên navxweyî, yan bi gotina wan ajan-provokator, û yên derveyî dihête kirin. Loma, wekî Arendt jî amaje dike, armanca rêxistineka wisa ew e, ku dijminên xwe bi temamî ji navê bibe û jibo hindê metodê terorê wekî meşrû dihêne dîtin. PKK her ji destpêkê ku derket holê dest bi jinavbirina hemî rikeberên xwe kir. Ev berojî rêxistin û rejîmên tîranîk û despot in, ku armanca wan ne jinavbirina temamî lê berfrehkirina qelemrewa sulte û desthilata wan bixwe ye. Armancên îdeolojîk ên van rêxistinan ji hebûna wan bixwe gringtir in, tenanet jibo bedîanîna armancên xwe ên îdeolojîk amade ne zemînên ku têde dixebitin feda bikin. Ango îdeolojî dikare berjewendîyên şexsî û neteweyî jibo îdeolojîyê feda bike. Çawan ku Arendt pêde diçe, qeware û bedena tevgereka wisa tam “ligor bedîanîna prensîpên rêber” (Arendt, 1951: 404) hatîye çê kirin. Ya ku di teorîya siyasî de wekî prensîpên rêber hatîye pênase kirin, heman dîyarde ye, ku di nav tevgera PKK de wekî “xeta rêber” (önderliğin çizgisi) hatîye destnîşan kirin.

**Grêdana îdeolojîk**

Armanca rêxistinên modern ew e, ku qencî û refaha xelkî biparêzin, yanjî heger xêra kollektîvekê neparêzin, qet nebe berjewendîyên şexsî yên hemwelatîyan ewle bikin û biparêzin. Ango di hevtevneka kurdistanî de, ev tevger hatîye meydanê ku berjewendîyên gelê kurd ewle bike û biparêze, lê jiber karakterê totalîterê xwe, tam dijî berjwendîyên kurdan tev digere, tenanet lihember vê boçûna xwe ya seyr û semere ji xelkî, wekî Arendt destnîşan dike “ji takên endamên xwe, grêdaneka tam û temam, bêsînor û bê qeyd û merc û neguhêrbar” (Arendt, 1951:323) daxwaz dike! PKK vê girêdana bêqeyd û merc di qalibê “grêdana bi rêberayetîyê” (önderliğe bağlılık) de pênase dike. Îcar ev grêdan ne di berjewendîyê gel û wî endamî bixwe de be, ne gring e.

**Propaganda û fîksiyon**

Alîyekê din yên rêxistinên totalîter dam û dezgehên propagandayê ye. Ev propaganda wekî Arendt dibêje, armanca wê xurtkirina îdeolojîyê ye, evca ne gring e, ka endamên wê bawerî pê dihînin yan na, heta ku tixûbên rastî û derewan di civakê de li hev şêlû bûbin, îdeolojî her di afrandina vatişên sexte de israrê dike. Arendt dibêje “bêyî elîtê û neşîyanîya wê ya hevotî ku nedikarî rastîyan wekî rastî bibîne, rastîyê ji sexteyê veqetîne, tevgera totalîter ticarî nekare di arasteya realîzekirina fîksîyon û aşopa xwe de tev bigere. Kalîteya here negatîv ya elîta totalîter ew e, ku ticarî nikare cîhanê wekî heyî bisêwirîne û ticarî derewan bi rastîyê re berawird nake. Fezîleta herî mezin ya elîta tevgereka totalîter girêdana wê bi Rêber re ye.” (Arendt, 1951:385) Tam ligor vê şirovekirinê karakterê serekî yê kadroyên PKK grêdana wan bi xeta Rêber re ye. Heta wê gavê ku grêdayî rêber bin, rastî û nerastî ne gring in. Sînorên sext û rastîyê ne şert e eşkere û zelal bin. Jiber ku rêber tenê pir e, ku grêdanê bi dinyaya derve re çê dike û hertişt ji perspektîva wî re dihête fîltre kirin. Di tevgera PKK de jî hertişt ji perspektîva serok/rêber de dihête şirove kirin. Fîltera sêwirandina cîhanê perspektîvên serok e. Rêber ligor vê boçûnê statûya “nexetabarîya bêdawî” wergirtîye. Yanê rêber ilelebed bêxeta ye. Tenê yên ku gotinên wî şirove kiribin, xetabar in û jê fêm nekirine. Di kitêba rêxistinî ya Partîya Nasyonalsosyalîst a karkerî ya Almanyayê (Organisatonsbuch der NSDAP) rêza yekem liser erkên endaman dibêje: “Der Führer hat immer recht”, ango Fuhrer/lîder hertim rast e. Evca fakta û rastî dikarin bihêne înkar kirin yan bihêne ji nav birin da ku rastîya îdeolojîya lîder bihête ewle kirin. Di îdeolojîya nazîsmê de, tam wekî ya apoîzmê de, “rêberê gel (mass leader) taybetmendîya serekî ya naxetabarîya bêdawî wergrtîye. Rêber ticarî îtiraf bi xetayên xwe nake.” (Arendt, 1951:349) Gelek caran gava ku stratejî û praktîkên PKK rastî şkestinê hatine, xeta ne li ba rêber, lê liba kadroyan e, ku nekarîne perspektîvên rêber bi qencî fêm bikin û wan bi qencî cî bi cî bikin.

Di bawerîya Arendtê de rehê civakên totalîter di nebûna eqlê selîmê endaman û meyla qebûlkirina rastîyên gumandar de ye. Jiber ku di civakên wisa de danûstandina îdeyan tune, şiyana eqlê selîm ku bikare faktayên derewîn venase ji alîyê hêzên totalîter ve hatîye têk birin, ku ev hêza totalîter dinyayeka derewîn liba endam û civaka xwe afrandîye. PKK di civakeka totalîter wekî Tirkiyê de serî hildaye; ji lewre karakterê civaka totalîter ya Tirk di mejîyê kolonîzebûyî yê PKK de çîl vedaye.

**Şeyteneta radîkal**

Arendt her ji destpêkê ve totalîtaryanîsm wekî formeka “şeyteneta radîkal” karakterîze kiribû, ku wê jî ev têrm ji Kant deyn kirîye, lê naveroka vê têrmê bi awayekê din şirove kiriye. Di pênaseya Kant de şeyteneta radîkal hingê rû dide, gava ku takek berdewam di şûna ku yasayên exlaqî peyrew bike, hertim bêexlaqîyê hildibijêre. Lê awayê ku Arendt şeyteneta radîkal bi kar dihîne dihête wateya bawerîya ku mirov nepêdivî/zêde/mişe û mezaxbar in. Yanê dikarin bi rehetî bihêne mezaxtin û xerc kirin. Bi kurtasî jibo tevgereka totalîter hebûn û nebûna wan û endam û alîgirên wan ne gring e, çawan ku Arendt (1951:459) destnîşan dike, “manîpulatorên sîstemê hem xwe û hem yên din zêde dibînin; kujerên totalîter hîn bêhtir metirsîdar in, jiber ku ne xema wan e ka ew bixwe zindî bin yan mirî.” Bi heman teherî qîmeta jîyana mirovî, evca çi endamên PKK bixwe bin yan kurdên din bin, zêde ne gring e, ya gring realîzekirina îdeolojîyê ye. Çawan ku ev tevger dikare bi hezaran mirovên kurd qurbanî stratejî û rêbazên xwe bike, bêyî ku rojekê bixwaze hesab bide xelkî. Yên ku divêt hesab bidin her endamên tevgerê û xelk bixwe ne.

**Dehumanîzekirina mirovan**

Taybetmendîyeka din ya karakterê totalîter ê PKK, jinavbirina zanav û nasnameya xweser ya takan e. Bi vî teherî PKK hem takên xwe hem jî yên din dehumanîze dike, yanê ji însanîyetê diêxe û dike amraz û navgîn. Takê ku bûye qurbanîyê helmetên dehumanîzekirina îdeolojîya PKK êdî ne dikare wekî mexdûr ne jî wekî mexdûrker bihête pênase kirin. Yê ku mexdûr e, di heman demê de dibe tawankar jî. Endamên ku bûne mexdûrê veşûştina nasname û şexsîyeta xwe, êdî dikarin wekî mexdûrker û tawankar tev bigerin û zilmê li kesên din bikin. Jibo vê dîyardeyê Arendt diyar dike ku, “terora totalîter hingê gihîşt kemala xwe û bi ser ket, gava ku kesê exlaqî ji reva kesane birrî û însîyatîvên biryarên wijdanî ji wan stand.” (Arendt, 1951:452) Ango di îdeolojî û sîstemeka wisa de ferd ji pîvanên xwe yên exlaqî yên kesî dihête dabirrîn û mekanîzmayên revê jiber ezaba wijdanê ji dihête standin. Di nav PKK de hevalên ku bi salan di sengerekê de têkoşîne dikarin nişkave hevalên xwe bişînin meydana înfazê. Mehmet Şener sembola berxwedana PKK ya zîndanan bû, lê bêyî hîç ezabeka wijdanî ji alîyê hevalên xwe yên partîyê ve hate înfaz kirin. Nasir (Bozkurt), ku komutanekê mezin ê PKK bû, bi şkenca hevalên xwe hate înfaz kirin! Dehumanîzekirin newîyeta mirovayetîyê di rêxistinên wekî PKK de ji xwe re dike hedef; di hizra tevgereka totalîter de mirov jê dihête payîn ku wekî tiştên pêşprogramkirî yan wekî piyonan tev bigerin, loma “hebûna karakterên kesane di nav takekesan de wekî gef dihête dîtin... takekesanî, yan hertiştê ku mirovekî ji yê din ciyawaz bike, nahête tolere kirin.” (Arendt, 1951:457) Ev heman karakterê tektîp ê kemalîst e, ku di hişê kolonîzebûyî yê PKK de çîl vedaye.

**Îdeolojî yan sexte-zanist**

Rêxistinên totalîter hewl di unîformîte û tekrengîyê de didin. Her hemwelatîyek dibe burxîyeka makîneya pêşveçûna dîrokî û siruştî ya totalîtaryanîsmê. Jiber ku gringîya wan tenê di qalibê xizmeta îdeolojîyê de dihête hilsengandin. Tevgerên totalîer di naxetabarîya lîderê bihêz de israrê dikin, ku civak û dîrokê kontrol dikin, û di heman demê de kesên asayî bêdesthilat dihêlin. Jibo serkeftinê, divêt berdewam di tevgerê de be û xwe ber bi armancên bêdûmahîk de pal bide, di heman demê de hertiştî jibo îdeolojîyê feda bike. Arendt yasayên zanistî û dîrokî yên tevgerên totalîter wekî “sexte-zanist” (Pseudowissenschaft) pênase dike, jiber ku rêsa û yasayên wan ne liser binemayê pirsyarbarîyê ne û hemî delîlên dijî wan dihêne îhmal kirin.

Arendt diyar dike, ku ”îdeolojî jibo karakterê xwe yê zanistî dihêne nasîn: ew boçûneka zanistî bi encamên peywendîdar ên felsefî re kombîne dikin û îma dikin ku felsefeya wan zanistî ye.... Paşgira –lojî di îdeolojîyê hema logoî ya yûnanî ye, ku dihête wateya zanistê. Heger ev rast be, îdeolojî hem sexte-zanist e, hem jî sexte-felsefe, çunkû di heman demê hem zêdegavîyê di tixûbên zanistê de dike, hem jî di tixûbên felsefê de.” (Arendt, 1951: 455)

PKK ligor heman rêbaza Arendt destnîşan dike, îdeolojîyeke sexte-zanistî heye û ji ekolojîyê bigire heta femînîsmeka sexte bi navê jinelojî bi dehan arasteyên qaşo zanistî afrandine. Lê ya sosret ev e, ku rewşenbîrên kurd herwekî gelek rewşenbîrên serdema nazîsmê de palpiştîya nazîsmê kirin, evro palpiştîyê didin vê îdeolojîya totalîter.



## Partiyên Bakur:

# PKK bi kiryarên xwe ji bo serxwebûnê astengî derdixe

■ DILŞAH AMEDÎ

Di navbera Yekîneyên Berxwedana Şingalê (YBŞ) û Pêşmergeyên Rojava ango Roj de li gundê Xanesora Şingalê di 3ê Adara 2017an de şer derket. Di encamê de YBŞeyiyek mir û YBŞeyiyek û çar pêşmerge jî birîndar bûn. Lê bi navbeynkariya Serokê Herêma Kurdistanê Mesud Barzanî agirbest hate ragihandin. Rayedarên Şingal û Herêma Kurdistanê li dijî vî şerî nerazîbûnên xwe anîn zimên û xelkê Şingal jî daxwaz ji PKK kir ku ji Şingalê derkeve.

Li aliyê din li gor pisporan du sedemên vî şerî hene. Ya yekemîn ew e ku Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) di sala 2015an de ji ber êrişên DAIŞê derbasî Şingalê bûbû. Piştî ku Şingal ji DAIŞê hate paqijkirin, PKK ji vê derê derneket û hêzên xwe li Şingalê bi cih kirin, baregeh ji xwe re ava kirin. Xelkê Şingalê, rayedar û mezinên Şingalê jî diyar kirin ku parastina wan li ser Wezareta Pêşmerge ne. Herwiha DYA jî di Kanûna 2016an de PKKê hişyar kir ku ji Şingalê vekişe. Herêma Kurdistanê jî ji ber ihtîmala birakujiyê hişyar kir. Piştî hevdîtinan PKK vê carê soz dabû ku dê ji Şingalê vekişe. Lê soza xwe neanîn cih.

Sedema duyem jî Pêşmergeyên Rojava ne. Rojekê berê vê aloziyê 500 Pêşmergeyên Roj li ser sînor hatibûn bicihkirin.

Li gor pispor û siyasetmedaran sedem Îran e. Îran û Iraq dixwazin bi hevkariya PKK, YNK û Goran li KDP û Herêma Kurdistanê zextan bike û wan bikişînin aliyê xwe.  Ji ber ku Îran dixwaze ji Iraqê heta Libnanê korîdorekê çê bike. Lewra pêdiviya wê bi Herêma Kurdistanê jî heye. PYD jî li Rojava vê polîtîkayê dişopîne. Loma nayê xwestin ku Pêşmergeyên Roj derbasî Rojava bibin.

**Barzanî: Ji bilî Pêşmergeyan pêdiviya Şingalê bi hêzeke din tune ye**

Dema ku şer qewimî Wezareta Pêşmerge, Fermandarê Hêzên Şingalê, Meclîsa Rûhanî ya Êzdiyan û Qeymakamê Şingalê diyar kirin ku divê PKK ji Şingalê vekişe. Ji ber ku pêdiviya Şingalê bi PKKê tune ye. Pêşmerge wan diparêze.

Serok Mesud Barzanî jî di hevdîtina xwe ya bi Şêxên Meclîsa Rûhanî ya Şingalê re got: “Ji bo rizgarkirina Şingalê gelek Pêşmerge şehîd ketin. Pêşmerge Şingalê diparêzin, parastinê berdewam dikin. Wê careke din tiştekî wisa li Şingalê pêk neyê.” Barzanî aşkere kir ji ber ku Pêşmerge li wê derê ye divê hêzên din



Herêma Kurdistanê û xelkê Şingalê ji PKKê daxwaz dikin ku ji Şingalê derkeve. Heta di navbera Yekîneyên Berxwedana Şingalê (YBŞ) û Pêşmergeyên Rojavayê de li gundê Xanesora Şingalê di 3ê Adara 2017an de şer derket. PKK tevî hişyarî û daxwazan ji Şingalê venakişe. Partiyên Bakurê Kurdistanê jî hebûna PKK rexne kir û diyar kirin ku divê PKK vekişe.

ji wê derê derkevin.

Serokên partiyên Bakur hebûna PKK ya li Şingalê û kiryarên wê ji Heftenameya Basê re nirxandin.

**Kardaş: PKK hewl dide ku xaka Herêma Kurdistanê bi dest bixe**

Serokê Giştî yê Partiya Demokrata Kurdistana Tirkiyê (T-KDP) Mehmeh Emin Kardaş bal kişand ser hewl û armanca PKKê û da zanîn ku PKK bi dagirkerên kurdan re tevdigere. PKK hewl dide ku xaka Herêma Kurdistanê bi dest bixe. Dixwaze wê xakê radestî dagirkeran bike. Êdî PKK dijmînê netewa kurd e û li dijî wê dijminatî dike. PKK li aliyê Îran, Iraq û dagirkerê rejîma Sûriyê cih digre û li gor fermana wan tevdigere.

Kardaş derbarê nêrîna xelkên Şingalê de jî wisa got: “Xelkê Şingalê jî êdî dibêje ‘êdî bes e û derkevin, em dikarin xaka xwe biparêzin.’ Xelk daxwaz dike ku ji Şingalê vekişe. Lê PKK dernakeve. Hewl dide ku xaka Kurdistanê dagir bike. Di vê de jî armanca wan ev e ku vê xakê ji kurdan werbigirin û radestî dagirkeran bikin. PKK li Bakur tu bajar rizgar kirine? Na. Ji şûna vê bajarên Bakur hilweşandin. Xelkên wê kuştin. PKK nikare Bakur rizgar bike.

**Tek: PKK xwe xwediyê tekane yê Kurdistanê dibîne**

Serokê Giştî yê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK) Mesut Tek jî derbarê vê mijarê de wisa axivî: “PKK xwe xwediyê tekane yê Kurdistanê dibîne. Ji bilî xwe tu hêzeke din qebûl nake. Polîtîkayên wê di çarçoveya polîtîkayên Îranê de têne çêkirin. Polîtîkayên xwe li gor polîtîkayên Îranê pêk tîne.”

Tek bal kişand ser kantonan û bi vê ameje kir ku PKK dixwaze desthilatiya wê derê bi dest bixe û bibe hêzeke mezin û dixwazin vê derê bikin kanton. Hemû kurd dixwazin Şingal û Kerkûk bi Kurdistanê ve bên girêdan û bibin parêzgeh. PKK li dijî vê daxwazê cih digre.

**Özçelik: PKK dixwaze di meşa serxwebûna Başûrê Kurdistanê de sergêjî di nav kurdan de çê bibe**

Serokê Giştî yê Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK) Mustafa Özçelik bi awayekî tund hebûna PKKê rexne kir û diyar kir ku berî her tiştî çi YPG, çi PKK çi YBŞ hemû hêzen çekdar li Başûrê Kurdistanê divê rêzê li hukimraniya Hikûmeta Herêma Kurdistanê û parlamentoyê bigire. Hewce ye PKK jî ji wê derê vekişe. Dijminên miletê kurd destên xwe dikin nav vê meseleyê.

Özçelik jî bal kişand ser armanca PKKê û got: “Siyaseta xwe li ser binpêkirina hemû pêkhatiyên kurdan çê dike. Herwiha ev siyaset nahêle ku kurd li Kurdistanê statûyekê bi dest bixin û dixwaze di meşa serxwebûna Başûrê Kurdistanê de jî sergêjî û tevlihevî di nav kurdan de çê bibe. Ev siyaset ne li gor berjewendiyên kurdan e. Ev di berjewendiya Îran, Iraq, Sûriyê û Tirkiyê de ye. Ew naxwazin Başûrê Kurdîstanê serbixwe be.”

**Karakoç: Pêwendiyên PKK bi hikûmeta Iraqê û Îranê re hene**

Serokê Giştî yê Partiya Azadî û Maf (HAK-PARê) Refik Karakoç derbarê pêwendiyên PKK yên bi Îran û Iraqê re axivî û da zanîn ku pêwendiyên PKK bi hikûmetên Iraq û Îranê re heye û bi wan re têkilî danîne. Ji bo siyaseta xwe ya pêşerojê li wan deran disekinin. Ev xeletiyekê mezin e. Şingal giredayî Herêma Kurdistanê ye û her tiştê wê jî giredayî Başûrê Kurdistanê ye. Hewce ye PKK ji wê derê derkeve. Bi vê kiryara xwe xizmeta berjewendiyên Îran û Iraqê dike.

**Çiftyürek: Meseleya Şingalê ne meseleyeke tena serê xwe ye**


Serokê Giştî yê ÖSPyê Sinan Çiftyürek bal kişand ser girîngiya Şingalê û vê wek meseleyekê mezin bi nav kir û wisa nirxand: “Meseleya Şingalê meseleyekê bi tena serê xwe nîne. Di nav vê de Kerkûk jî heye. Şingal giredayî Hikûmeta Kurdistanê ye û pêşmerge li wê derê ne. Tu kes nikare bêyî destûra Hikûmeta Kurdistanê bikeve wê derê.”

Çiftyürek eşkere kir ku Şingal xaka Kurdistana Başûr e. Başûrê Kurdistanê îro gava serxwebûnê diavêje û bi vê re sê pirsgirek derketine holê. Şingal, Pêşmergeyên Roj û Kerkûk... Heger PKK wan bide ber xwe, bi riya aştî û demokratîk bê çareser kirin. Divê PKK bi Herêma Kurdistanê re rûne û bi awayekî aştî û demoratîk çareser bike.

**Bucak: PKK dixwaze ji bo serxwebûna Kurdistanê asteng derxe**

Serokê Giştî yê Partiya Demokrata Kurdistanê (KDP) Sertaç Bucak jî vê mesele wiha rave kir: “PKK dixwaze ji bo serxwebûna Kurdistanê asteng derxe û ji bo vê jî aloziyan derdixe. Ya duyem jî dewletên weke Îranê ku dijminatiya miletê kurd û serxwbûnê dikin, piştevaniya wê dikin. Rojava teslîmî rejima Esad kir, dê di demekê din de teslîmî Îranê bike. Ya sisiyan jî ev e ku tu mafê wan tune ye li Şingalê bisekinin. Ji ber ku Şingal giredayî Herêma Kurdistanê ye û ew dixwazin bi piştevaniya Îranê, Herêma Kurdistanê ji Şingalê derxin. Ev jî kiryareke li dijî kurdayetî û Kurdistanê ye. Ev tişt ji aliyê me ve nayê qebûlkirin.”





FIRAT CEWERÎ

## Alfred Nobel

Alfred Nobel di 21ê cotmeha 1833an de li paytextê Swêdê, li Stockholmê hatiye dinyayê. Malbata wî Nobelius, hê di salên 1600î de navdar û xwediyê gelek keşifan bû. Bavê Alfred, Immanuel Nobel bi xwe jî gelek keşif kirine; ew peyayekî zana, bêÚfireh û zilamê endustiriyê bû. Her çiqas ew swêdî û ji herêma Kristianstadê bû jî, dîsa wî gelek salên xwe li Petersburgê buhurandine. Mayinên binavê ku ji aliyê Immnuel de hatibûn dîtin, di şerê Krimê de hat bikaranîn. Gelek welatên ku diketin şeran dixwestin wan mayinên binavê bi dest bixin da ku pê zora neyarên xwe bibin. Immanuel ne bi tnên keşifa mayinên binavê kirine, wî di pêvajoya salan de, di warên cihê de gelek keşifên din kirine.

Ji vî bavê xwediyê zanebûneke kûr û dûrbîn, ji bilî Alfred, sê zarokên wî ên din jî çêbûne; Robert, Ludvig û Emil.

Zarokan ji dan ser şopa bavê xwe û dest bi keşifa tiştên nû kirin. Keşifên vê malbata xwediyê fikreke dûrbîn, nizanim çima, lê bi giranî alavên şer bûne. Bi dîtina wan, dema şûr û mertalan li dû dima, merdî û mêrxasî dimir û demeke nû, dema jîrî û zîrektiyê dest pê dikir.

Alfred Nobel li Stockholmê hatiye dinyayê lê wî bi salên xwe ên pir biçûk koçî Sankt Petersburgê kiribû û piraniya temenê xwe li bajarê Dostoyevskî buhurand. Hem di dema zaroktiya xwe de, hem jî di dema xortaniya xwe de wî qîma xwe bi jiyana rojane û sivik nedianî, wî her tim dixwest li der û dora wî tiştin biqewimin, tiştin nû derkevin, celebê jiyanê were guhertin û civat nû bibe. Loma ew li gelek welatan digeriya û li her welatî fêrî tiştekî nû dibû û pirsgirêkin ku diviyabû bihatana çareskirin di sere wî de çêdibûn. Vê yekê ew dajot ser kûraniya fikrê û hewcedariya dîtina tiştên nû. Hînbûna tiştên nû ji bo keşifên wî jê re dibûn wek çirayê û riya wî roÚî dikirin.

Di sedsalên buhurî de Parîsa ku hertim wek çavkaniya huner û edebiyatê tê bibîranîn, salekê ji Alfred Nobel re jî mazûbantî kir. Xwendina Nobel ya li Parîs ji bo keşifên wî jê re bû çavkaniyeke pir baş.

Piştî şerê Krimê (1853-1856) malbata Alfred ji Petersburgê vegeriya welatê xwe. Lê Alfred ji bo ceribandina patentên xwe bi malbatê re venegeriya, ew piştî wan bi çend salan, di payiza 1863an de vegeriya. Ew piştî vegera xwe ranewestiyan, dengê teqîna alavên wan ên şer ew ji xewê dipengizandin û ew dixistin nav tevgerê û diajotin ser dîtina keşifên nû. Vê malbata bi gir, mîna li Petersburgê, li Swêdê jî xebata xwe dewam kirin. Lê li Swêdê, di sala 1863an de bobelateke mezin hat sere malbatê. Birayê Alfred, Emil, di dema ceribandina keşifeke xwe de, keşifa wî pê de diteqe û dimire.  Ev bûyera trajî tesîreke mezin li malbatê dike û demekê destên wan li kar û keşifan sist dibe, lê paşê dîsa radibin û êdî keşifên mezin dikin. Alfred daxwaza birayê xwe Emil bi cih tîne û dînamîtê dibîne.

Ev keşifa Alfred Nobel paşê bû bingehê avakirina kargeha alavên şer û çekên giran, Bofors. Herweha ew li dinyayê bû sebeba gelek şerên mezin û sebeba kuştina bêhejmar mirovên di temenê birayê wî Emil de.

Alfred Nobel piştî keşifa xwe ya dînamîtê pir dewlemend bû. Ew bû xwediyê fabrîqeyan, malan, makînan… Lê digel vê dewlemendî û şarezatiya xwe jî, dîsa ew bi tenê bû; hevalên wî kêm bûn, ji mirovan pir dûr bû. Ji xwe di warê evînê te tîra wî li tehtê ketibû. Ew nezewicî, zuriyeta wî çênebû.

Alfred Nobelê ku zêdeyî hezar keşif kiribûn û xwediyê sêsed patentî bû, di warê ruhî de aciz bû, carina li dîwarê depresiyonê asê dima. Ew xwediyê serweteke mezin û navekî giran bû, lê xemgîn û dilêş bû.

Herçiqas keşifa wî ya dînamîtê ew navdar û dewlemend kiribû jî, ew vê dawiyê ji ber keşifa xwe pir xemgîn bû. Armanca keşifa wî ne ji bo şer û pevçûnan, lê ji bo miorvatiyê, ji bo vekirina rê û asêgehan bû.  Ji ber ku Alfred Nobel bi xwe ne mirovekî şerxwaz, lê aştîxwaz bû. Wî di dema xwe de pir piştgiriya tevgerên aştiyê dikir. Loma, ji bo ku aştîheziya xwe diyar bike, wî dijîtiya xwe ya şer îlan kiribû û poşmaniya keşifên alavên şer dijiya. Ji bo ku ew xwesteka xwe ya ji bo jiyaneke xweş û cîhaneke bêyî şer û pevçûn bigihîne nifşê nû, wî di wesiyetnameya xwe de da xuyakirin ku qismek ji serweta wî, wek xelat, li mirovên ku ji bo aştî û mirovatiyê tevdigerin û tiştên mezin dikin, bête belavkirin. Loma, bi navê Nobel, ji salê carekê, di warê navnteweyî de xelatên aştî, edebiyat, fizîk, kîmya, fizyoloj/tip û ekonomiyê tê belavkirin. Herçiqas keşifa wî bûbe sebeba gelek şeran jî, bi vê helwesta wî ya aştîyane gunehê wî hinekî siviktir dibe…



NADÎRE GUNTAŞ ALDATMAZ

## Hem zî Kemane Cineno

Nê rojan de qismêkê hawa Derê Laçî vîra mi ra nêsona. Versîyonêde ê qisimî nîyar o:

“Halo halo, halê ma yaman o,
Ordî onto ma ser,
cayê de rayê ma nêdano.
Haq adirê aşîrû wedar o,
kes ma rê ‘Ala qutare’* nêvano.

Şarê Dêrsimî wextê qirkerdişê 1938î de rema, koyan de, eşkeftan de xo dard we la dewlete ê canêverdayî û esker heta zereyê eşkeftan şî, têde qir kerdî. Nê eşkeftan ra yew zî Derê Laçî de bî. Şaîrê Dêrsimî Silo Qiz na lawika xo Derê Laçî ser o vata. Na lawike, bêkesîya ke o wext, ê tede bîyê ana verê çimanê ma. Gelo nika zî ma hende bêçare yîme? Kiştena Kemal Kurkutî belkî ma bêçare verdayîme coka na lawike yena vîra mi. Seke dewlete eynî dewlet a û sey dişmena kan a, seke heyf gêna.

“...Mi va hewrî vejîyay hewrê sûrî,
Dîyarê Dêrsimî ra nêkune dûrî...
Mi va biko lerze meke,
Ravêr meso, rew memire.
Ordîyê hukumatî zaf o,
Dinya ma ser o kerda sacya sûre...”

Ancî dinya kerda tenge û ancî kes “Ala qutare” nêvano. Tirkîya de aqil zî vîndibîyayene der o. Heya vîcdan çin bî, hîs, merhamet û însanîye çin bîyê la çarçewaya mantiqê înan de tenê aqil hîna mendbî. Nika o zî vîndibîyayene der o. Çi heyf ke Newroze her serre ma rê yew derd peyda kena. Emser zî yew derdo giran peyda kerd. Tabî ke sucê Newroze nîyo, ê ke tehamulê xo bi Newroze çin o, rasta xo ê ke tehamulê xo bi kurdan çin o, sucê înan o. Û tabî ke suco girs yê dewlet a. Dewleta ke qeyretê hemwelatîyan nêkena, herinda hemwelatîyanê xo de qatilan seveknena, suco pîl yê aye wo.

Serran ra ver pîrozkerdişê Newroze qedexe bî. Gencan merdena xo girewtêne xo çim û dizdî ya şayîya Newroze kerdêne. Dizdî ya kaykerdene! Kay dizdî ya beno yanî nimitkî beno? Çikê kayî de teror esto ke? O wext kayê Newroze zî qedexe bî. O wext zî hukumatî emir dayêne ke “panê”. Panê panê panê... Çewres serrî yo panê...heta kotî, heta keyî ? Peynîye de ke tey bas nêkerd, axirî Newroze qebul kerde la Newroze na rey zî bîye yê tirkan. Wa henî bo, şima zî pîroz bikerê. Teba kesî destê şima ra girewto çik o! Tirkî zî eke wazenê wa ê zî pîroz bikerê. Peynîye de yenê yew ca, şayîye kenê, kay kenê. Kurdî hende xirabin ê ke şayîya şima rê çimesîyayîye bikerê ? La şima kenê, şima kenê. Adir keyeyanê şima kewo, keye şima bivêso ke şima kenê.

Derdê kiştena Kemalî çayê derdê her kesî nîyo? Yew lajeko sîvîl, talebeyê fakulte yo hem zî kemane cineno. Kemane cineno. Şima caran dîyo ke lajeko sey ey terorîst bibo? Çi karê terorîstî bi kemane esto! Destê terorîstî de çek beno, kemane nê. Lajekî kişenê dima çente saye kenê ke tey bomba bivînê la çente ra kitabê şîire vejîno. Ê polîsan ke kitab di çi fikirîyayî? Gelo zerrîya înan çizayê? Ez emîn a ke ê polîsan Kemal sey însanî nêdîyo. Motîvasyonê înan henî yo ke ê kesanê muhalîfan qet sey însanî nêvînenê. Coka rehet kişenê.

Keso ke hîna pirtikê vicdanê xo mendo, keso ke domanê xo estê, keso ke wayîrê xortê sey Kemalî yo gereke kiştena ey xo rê derd bikero. Çike mumkun o ke na kiştene her ca de, her deqa bêro sereyê her kesî ser de. Çike na kiştene kiştene nîya, na kiştene, peynîya pirkerdena kîn û nefretî ya. Peynîya propagandaya sîya ya. Çend serrî yo bi zehîr polîsan perwerde kenê. Çitur ke serra 1938î de va nê însan nîyê, nêm heywan ê, gawir ê, qetlê nînan vacib o û esker nîya tiz kerd verda rê şarê Dêrsimî ser ewro zî eynî qeyde yo.

Maya Kemalî leşa ey ya nêmvirane û ortê gonî-gonaşîrî de çitur xo vîrî ra bikero, çitur? Raştî lajek çayê viran o? Kes zaneno? No serdê wisarî de, serdê şodirî de no lajek çayê viran o? Tayê vanê tîşorta lajekî ser o “Kurdîstan” nusîyaye bîyo coka kişto. Belkî raşta zî winî yo. Sebeb çi beno wa bibo, verê çimanê dinya alemî de yew xorto sey şêrî na pa, eşt be erd. Dima va tey bomba bîya, tey nêzan çik bîyo. Pane, dima vaje tey bomba bîye, tey kardî bîye. Kes nêtawreno ke to ra çîyê biperso. Dima nê fotografî ke nêvejîyayêne belkî zaf kesî bawerîya nê xeberan kerdêne. Yew rojnamegerî (Abdurrahman Gök) ke nê fotografan nêantêne înan Kemal sey “bombaci” lanse kerdêne.

Fotografî vejîyay meydan ke lajekode nêmviran, pantole teng, derg û semt orte de zirçeno, yew polîs zî pey de nîşan gêno û nano pa erzeno erd. O bi şaşîye zirçeno, merdene qet nêhesabneno. Hîna rew o, hîna zaf genc o. La mireno. Kesî ra veng nêvejîno? Çend kesê ke tim vengê vicdanê xo kenê berz, înan ra teber kesî ra veng nêvejîno. Her kes xo rê seyr keno. Ez nêzana çend kesî lajê xo, birayê xo kerd herinda Kemalî? Ez meraq kena gelo kesî va “No ke lajê mi bîyêne se bîyinê, mi se kerdêne?” Haq kerdoxan rê nêverdo û sabir bido maya Kemalî. No zulm lingê rew biqedîyo.

* Allah kurtara (bi tirkî)
nadirega@hotmail.com

# Provaya rojnamegerîya kurdkî ya Tirkîya:
# ROJNAME


EGER SEROKÊN DUNYÊ JIN BÛNA
RÛPEL 25
HOSTAYÊ ZIMAN CELADET BEDIRXAN
‘WEDAT ZANIBÛ WÊ BÊ KUŞTIN’
RÛPEL 18-19
ŞIVAN VEDIGERE WELAT?
RÛPEL 39
2 RÛPEL DIMILÎ
ROJNAME
HEJMARA PROVAYÊ
TELEFON: 1/517 13 78
7000 TL. 10 MARK



MUTLU CAN

Ma do tîya behsê yew rojnameyê kurdan ê îstîsnayî bikê. Nameyê nê rojnameyî ROJNAME yo. Rojname, tena tarîxê rojnamegerîya kurdan de ney îhtîmal o ke yê dinya de zî cayêko îstîsnayî girewto. Beno ke şima bipersîn û vajîn “çira?” Ma hîkayeya ROJNAMEYî bi kilmîye binusê; 1991 de hukmatê Turgut Ozalî muxalefetê kurdan û tazyîqê Ewropa ver bêçare mend û qanûno 2932 numreyin wedarna. No qanûn hetê cuntaya faşîste ya Evrenî ra ameybî vetene û destûr nêdayêne ke tirkî ra teber yewna ziwan de weşanî bêrê kerdenê/vetenê. Eslê ci de derd, warê weşangerî û çapemenîye de qedexekerdişê kurdkî bî. Wedarnîyayîşê qanûnê 2932 numreyinî ra dima Tirkîya de hetê huqûqî ra vernîya weşangerîya kurdkî de engel nêmaneno. A roje; roja ke Ozal nê qanûnî wedarneno hişê Eşref Okumuş (Mesulê Weşanê Pêroyî yê Rojnameyî) û Alî Coşarî (Mesulê Ewropa yê Rojnameyî) de, fikrê vetişê Rojnameyî peyda beno. Çunke seke ma cor ra zî va verê vejîyayîşê rojnameyêkê kurdkî de tu asteng nêmaneno. Senî ke Alî Coşar heme mesrefê hûmara provaye gêno xo ser, xebata amedekerdişê Rojnameyî zî dest pêkena. Goreyê melumato ke Eşref Okumuşî da ma hûmara provaye ya Rojnameyî teberê Tirkîya [Ewropa] zî tede da-pancas hezar hebî çap bîya û temamê ci heme bayîyan ê bajaranê Tirkîya de roşîyayê. Okumuşî dewamê nê zanayîşan de wina va “Ma zî nê serkewtişî ra cesaret girewt û çend teşebuskarî (karsazî) ke goreyê ma eşkayêne fînanskerdişê Rojnameyî bigirê xo ser, înan reyde têkilî ronayî ...” La çi heyf ke ê nêresenê amancê xo û nêeşkenê weşanê nê rojnameyê kalîteyinî bidomnê. Rojname, 29.12.1991 de ancax tek hûmare; sey hûmara provaye ya 40 rîpeline vejîyaye. Gama ke ma ewro ewnîyenê Rojnameyî ra vînenê ke kadroyê Rojnameyî, 26 serrî verê cû hem hetê kalîte hem zî hetê muhtewa ra xebatêka merdim ganî teqdîr bikero kerda. Werrekna emrê Rojnameyî hende kilm nêbîyêne û bi seyan, bi hezaran hûmarî bivejîyênê. Heyf ke mumkun nêbîyo. Qey mumkun nêbîyo? cewabê naye dewamê îfadeyanê Okumuşî ke ma cor ra mîyanê îşaretê neqlkerdişî de daybî de estbî feqet ma bi zanayîş tena qismo ke seba nê nuşteyî lazim bî, ey neql kerd. (Sebebê dewamnêkerdişê Rojnameyî ser o qalê ma yo peyên no yo; sedemo tewr verên o ke bêro aqilê zafaneyê şima, o nîyo)

Rîpelê dîyinî yê ROJNAMEyî de yew metno ke semedê rojnameroşan nusîyayo esto. No tekst rasta zî zaf balkêş o û ma coka o açarna kirmanckî ser û ey nika neqlê cêrî kenê. Semedo ke ma xususen eleqedar keno ganî ma vajîme ke 2 rîpelê ROJNAMEyî zî bi kirmanckî vejîyayê. Mamosta Malmîsanjî zî mîyanê kadroyê Rojnameyî de ca girewto û çend nuşteyê muhîm û hîsinî nuşte. Ma pêşnîyaz kenê ke şima zî keyepelo ke ma cêr ra nîşan dayo bitiknê û Rojnameyî uca ra bîyarîn war û bikeyf biwanê.

http://www.arsivakurd.org/index.php/rojname/90-rojname/2393-rojname-o

## BAYÎYÊ ROJNAMEYAN O ERJAYE!

Rojnameyo ke to dest de yo, rojnameyê ke to hetanî nika rotê înan ra cîya yo... O ziwano ke zafaneyê şima fehm nêkeno bi ê ziwanî, kurdkî de vejîyeno. Beno ke şima do reya verêne rojnameyêkê kurdkî biroşê.

Ronîyayîşê komare ra nata kurdan 92 rey rojname veto la heme zî ameyê qedexe kerdene.

ROJNAME, teşebusê ma yê neway û hîrêyin (93) o.

Beno ke ROJNAME bêro sucdarkerdiş, ci rê hêrişî bêrê kerdene. Hetta beno ke tayê kesî şima ra vajê “nê rojnameyî meroşe” Ma ney nika ra hîs kenê. Neke ma hukmpeşîn ê, 92 rey ame sereyê ma ser aye ra...

Îran û Îraq de rojnameyê kurdan serbest ê. Tirkîya nê welatan ra apey a? Ganî ma nê persî xo ra pers bikîme.

Ma her hemwelatîyo ke wazeno herinda nefreto nijadperest de atmosferê wa û birayî û heskerdişî tesîs bibo ra piştîyayewbînangirewtiş wazenê. Meseleyê ma çiqas giran benê wa bibê, bawerîya ma na ya ke ma do bieşkê înan zemîno ke bingeyê ey heskerdiş û îtîmadkerdişî o mîyan de çareser bikê.

Semedo ke no atmosferê îtîmadkerdişî yo bêro awan kerdene îcab keno ke welatê ma, Tirkîya û Kurdîstanê ma de hîna zaf rojnameyî bêrê vetiş.

Labelê verê ganî heqê payramendişê ROJNAMEyî bêro nas kerdene û destûr nêdîyo ke sey 92 rojnameyanê bînan emrê xo kilm bo, mîyan ra bêro wedarnayene.

Ma serra şima ya neweye pîroz kenê û heskerdişanê xo pêşkêşê şima kenê.

ROJNAME

# Feraseto nêrî


MURAD BURTAKUÇÎN

Dinya ser o, bitaybetî zî rojhelato mîyanên de fersaetê nerî hukm keno. Merheleyê verênî yê komelkîbîyayîşî Mezopotamya de qewimîyayê. Nê komelkîbîyayîş ra dima berardişê tef-talan û fealîyetê ziretî dest pêkerdî û neticeyê nînan de yew mehsulo zedê vejîya ortê. Zedêbîyayîşê mehsulan ver fikrê hegomonya hêdî-hêîdî xurt bî. Naye ra girêdaye hişê komelan de ferasetê hegomonya ke fikir, xoza û cinîyan ser o tesîro menfî keno virazîya. Xurtbîyayîşê fikrê hegamanya de xeta bihêze ya tewr verêne ferasetê nerkîtî ya. Her kes, her komel, her dewlete bi ferasete xo yê nêrkîtîyane xo wesifneno û wazeno ke bi nê ferasetê xo heme merdiman ser o hukm biko.

Ferasetê nêrkî, merdimê ke şexsîyetê înan ser o tedayî bîyê, hîsê înan ameyî rencîdekerdiş, vernîya awanbîyayîşê qerekterê înan o ferdkî ameyo girewtiş, semedê înan yew rayîrê xotetmînkerdiş o. Ciniyî bi wesîleyê makîyîya xo leteyêkê xoza yê. Estena cinîyan bi her hewa çimeyê rindî yo. Camêrdî sey cinîyan nîyê, nêeşkenê dewamîya cuye bîyarê çunkê rehîmê înan çin o. Aye ra camêrdî timûtim na kêmîya xo vînenê, sedemê naye çimanê xo de cinîyan sey dişmenan vînenê û vera înan şer kenê. Kodê ferasetê nêrkî yê merdimahî, wextanê zaf kehenan ra nata mîyanê cuye de awanbîyayîşê xo temam kerdê.

Ronîyayîşê modernîteya kapîtalîste ra dima feraseto nêrkî bi formo hîna sîstemkerde û organîze domîyeno. Tesîrê ferasetê nêrkî, cuya ma ser o bi hawayo cîya-cîya û têmîyankewte hukm keno. Tarîxê dewletan û yê ferasetê nêrkî hemwext ê. Çunkî dewlete goreyê estena xo çîyêko nêrkî yo. Dewlete zî sey ferasetê nêrkî vera berardişanê fikrî, hunerî, ekonomîkî de astengêko hegomonîk îfade kena. Bêguman ferasetê nêrkî û dewlete mîyan de têkilîyêka organîke esta. Hetêk ra ferasetê nêrkî zîhnîyeto dewletane awan kerdo heto bîn ra dewlete zî bi pêro îmkananê xo xebitîyena ke komelî mîyan de ferasetê nêrkî hakim biko. Têkilîya ke faşîzm, feraseto nêrkî û dewlete mîyan de esta, ganî aye ser o etudêko hîra û baş bêro kerdene. Dewleta ke ma bi binê hegomonyayaye ci de ciwîyenê, her komelî ser o nê hîrê unsuran zî bi hawayo aktîf xebitnena. Beno ke hetê tewr balkêş yê nê mefhumî zî no bi xo bo. Dewlete senî bifikirîyo fikrê ferdanê komelî zî bi o şekil vurîyeno.

Dewletî, têkilîyanê xoyê mîyannetewîyan de senî metodan biramê, hemwelatîyanê xo ser o tesîrê înan zî goreyê ê metodan benê. Demêk mabênê Îsraîl û Tirkîya de yew krîz qewimîyaybî. Tesîrê naye ra merdiman kuçeyan de coca-cola rişnayênê. Çiyo balkêş zî no bî ke înan bi no hereket seke xo tetmîn kerdêne. No reaksîyon çîyêko normal nêbî û yew problemo patoliojîko ruhî nîşane ma dayêne. Nika wextanê peyênan de, na rey zî dore ameye Hollanda û Almanya. Krîzo ke mabênê nê dewletan û dewleta Tirkîya de qewimîya ver eynî hawa reaksîyonî yenê dîyayîş. Merdimî na rey zî hêrs û heyfê xo porteqalan ra vejenê û gene înan goya bi kardî birîndar kenê. No hereket, îfadeyê zîhnîyetê faşîzmî ra teber tu çîyêk nîyo. No qayde camêrdîya xo porteqalan ser o tetbîq kenê. Reyna goya wazenê ke ala Hollanda biveşnê şonê ala Fransa veşnenê. Xulasa nimûneyê winasî musnenê ke ferdanê nê komelî de qebilîyetê fikirîyayîşî normal nîyo û ê ê fikrê merdimahî ra çend dûrî kewtê.




Fikrê merdimahî ferasetê makî ya, fikrê merdimahî weşîya xoza de nimite yo. Fikrê merdimahî heq û huqûqê her kesan seyyewbînan vînayîş o. Feraseto nêrkî wazeno ke ma fikrê merdimahî ra dûrî bêro. Di rayîrî estê; yan ma zî ferasetê nerkî vera çok danî erd û ma benê dişmenê makîyîye, dişmenê ferasetê merdimahîyê! yan zî ma hetê makîkîya de ca genî û ma wanenî, cigêrayîş kenî, persenî, her kesî xo seyyewbînan vînenî, heqê her kesî sey heqê xo pawenî!

# Unîversîteya Bîngolî (Çewlîgî) de zazakî ser o semîner

**TIRKÎYA** de heşt unîversîteyê ke binê banê înan de beşê Ziwan û Kulturê Kurdan/ Kurdolojî abîyê, yewa înan zî Unîversîteya Çewlîgî ya. Na unîversîte de wendekarî sewîyeya lîsans, master û doktora de bi kurdkî (kurmanckî û kirmanckî) perwerde benê. Labelê sey Unîversîteya Dêrsimî (Munzur) na unîversîte de zî eqsê unîversîteyanê bînan qismê lehçeya kirmanckî/zazakî beşê kurdolojî ra ameyo cîyakerdiş û sey "Zaza Dili ve Kültürü" (Ziwan û Kulturê Zazayan) awan bîyo. Helbet no tercîh hem hetê perspektîfê zanistî hem zî hetê polîtîkayanê pratîkan yê dewlete ra yew nakokîye (çelîşkî) teşkîl keno. Çunke bi hawayo ziwannasî dîyar o ke zazakî dîyalektêkê kurdkî yo û kirmancî/zazayî xo bi seserran o ke sey kurd vînenê. Heme delîlê tarîxî, sosyolojîk û folklorîkî zî na rastîye tesdîq kenê. Dewlete bi xo zî na lehçe unîversîteyanê bînan de (Artuklu, Mûş, Wan, Dîcle), û qatê Wezaretê Perwerdeyî (materyalanê dersa weçîniteye yê kurdkî) de sey lehçeyêka kurdkî vînena la balkêş o "Dêrsim û "Çewlig" de pratîko cîya tetbîq kena. Helbet çîyê ke na mesela ser o bêrê vatiş zaf ê la ma wazenê yew aktîvîteyo muhîm o ke çend rojî verê cû na unîversîte de bî, şima ey ra xeberdar bikîme.

Kluba Ziwan û Edebîyatî ya wendekaranê Unîversîteya Çewlîgî 28. 03. 2016 de Salona Konferansî ya Unîversîteya Çewlîgî de zazakî ser o yew semîner organîze kerd. Qiseykerdoxê semînerî cigêrayox û nuştox Seîd Veroj bî. Nêzdîyê di sey wendekaran ra teber zafê akademîsyenanê beşê kurmanckî û zazakî zî beşdarê nê organîzasyonî bîyî.

Verojî, verê muneqaşeyê îlmîyê ke cîyakerdişê lehçe û ziwanan ser o benê, înan ser o vindert û cigêrayîşî ke oryantalîst û ziwannasan derheqê zazayan û zazakî de kerdê, netîceyê înan neql kerdî. Verojî, dima ra çarçewaya xebata xo "Veracekerdena Gramerê Zazakî û Kurmancca: Dîyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî " ke eynî wext de babeta tezê ey ê masterî ya de verê cû kurdkî çi ya û ziwananê dinya de cayê kurdî çi yo? Naye ser o melumat da. Dewamê qiseykerdişê xo de hetê fonetîk û morfolojî ra zazakî û kurmanckî babet bi babete muqayese kerdî, xusuŝîyetanê muşterekan û cîyayan yê her di dîyalektan ra nimûneyî dayî û va "Ma vînenê ke taybetîyê zazakî heta % 60-70 sey yê kurmanckî yê, % 30 cîyabîyayîşê aye zî normal o. Çunke netîce de heme lehçeyan mîyan de hende cîyayî bena." Seîd Verojî, behsê muhîmîya perpektîfê ziwanzanistî kerd û va "Seke netîceyanê xebatanê îlmîyan ra zî dîyar beno zazakî sey kurmancî, soranî, hewramî û lurî lehçeyêka malbata kurdî ya. Akademî warê îlmî yê, ganî rastîyanê zanistîyan xo rê sey zemîn bigîrê û binê tesîrê îdîayanê subjektîfan û propagandatîfan de nêmanê" Cigêrayox û nuştox Seîd Verojî, dima persanê beşdarbîyayoxan rê cewabî dayî û badê semînerî kitabê xo îmza kerdî.



# Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî:

# Diyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî

PÊŞAR BEXTEWER

**SERRANÊ** peyênan de warê kurdolojî de xebatê erjayeyî benê. Çi kurmanckî çi kirmanckî bê, tayê nê xebatan zî tezê masterî kê beşanê kurdolojî yê unîversîteyan de temam benê yê. Babetê nê tezan hîna zaf gramerê kurdkîya kirmanckî, muqayesekerdişê fekanê aye, arêdayîş û analîzê folklorîkî yê. Helbet nê xebatî semedê ma gamê destpêkerdişî yê û semedo ke bingeyê pêserîya ma ya akademîke teşkîl kenê muhîm ê. Nê tewir xebatan ra yewe zî hetê mamosta Seîd Verojî ra ameya kerdene. Nameyê xebata ey a tezê masterî ke eynî wext de sey kitabêk çap bîya **"Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî: Diyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî"** yo. Xebata ey hîrê beşan ra yena pê; beşo yewin de dîyalektê zazakî û kurmanckî ser o yeno vindertiş, beşo dîyin de hetê alfabe û fonetîkî ra analîzê her di lehçeyan, beşo hîrêyin de zî zazakî û kurmancî hetê morfolojî ra yenê tehlîlkerdiş. Veroj, xebata xo de bi hawayo muqayeseyî xebitîyayo û heme babetan de her di lehçeyan ra gelek nimûneyî dayê. Ey, bi no hawa hem bingeyê îlmî yê xebata xo kerdo pêt hem zî tezê xo kerdo dewlemend. Xususen xebatê gramerî û folklorîkî yê winasî do nasbîyayîşê îlmî yê lehçe û kulturê ma de rolêko pozîtîf kay bikê û bibê wesîleyê xebatanê hîna başan yê demê ameyeyî.

Naye ra teber eke merdim fealîyetanê ê kesanê ke kurdkîbîyayîşê zazakî înkar kenê bîyaro xo vîr, qiymetê xebatanê winasîyan hîna weş fehm keno. Ma cahîlê nê derûdoran ê ke haya înan cahîlîya xo ra çin a bidê hetêk vînenê ke tayê merdimê înanê ke wayîrê sifetê akademîsyenî yê û goreyê vatişanê înan xebatanê xo de goya bi goreyê feraset û metodanê îlmî xebitîyenê, bi zanayîş da-pancês formanê tewr dûran yê çekuyanê her di lehçeyan muqayesê kenê û peynî de vanê "ma bi no şekil îspad kerd ke zazakî kurdkî nîya, xoser yew ziwan o" La tu eleqeyê analîz û meqaleyanê înan bi krîteranê ziwannasîye çin o. Xora metod û retorîkê înan ra zî zaf rehet yeno fehmkerdiş ke ê bi zîhnîyeto subjektîf û falsîfîkasyonîst hereket kenê. Xora eslê ci de hedefê înan o esasî kurdîtî ra dûrîvistişê na grûba kurdan o. Bi kilmîye ehemîyetê nê tewir xebatan nê hetî ra zî esto. Bêguman hêvîya ma a ya ke xebatê winasî tena hîna zêde nebê bi hawayo hîna zaftewirîye û hîra zî bêrê kerdene.

**Xebate ra***

**... Major E. B. Soane zî der heqê ziwanê kurdî û ferqê mabêna dîyalektandê ênan de vano:**

"Lehçeya mukrî û gilandê aye ra teber Kurdistan de sewbîna lehçe û şêweyî zî estî û pêro zî xo sey kurdandê xasan qebûl kenê. Enê lehçan ra yewêda tewr mûhîm zî lehçeya zazakî ya. Zazayî, kurdan mîyan de grûbêda gird a û derûdorê Diyarbekir, Ezirgan û tayê cayandê Anatolya de ciwîyenê. Vêşaneya ênan mintiqa koyan de ciwîyenê, zaf tund û cesûr î. Bi yew lehçeya saf a arî qalî kenê. Lehçeya ênan hem lehçeya mukrî ra û hem zî lehçeyandê bînan ê kurdî ra cîya ya. Sey ziwanandê arî, gerek ena lehça ser o zî xebate bêro kerdiş. Lehçeya zazakî; farisî ra vêşêr nizdîyê ziwandê kurdî ya"

**Zîya Gokalp** o ke bi xo çêrmûgi o, dîyalektanê ziwanê kurdî eno hawa tesnîf keno: 1- kurmancî, 2- zazakî, 3- soranî, 4- gûranî û 5- lûrî.

**Roger Lescot û Celadet Alî Bedirxanî** ke "Gramera Kurdmancî" hadirnaya, der heqê dîyalekt û şêweyanê ziwanê kurdî de vanê: "1- kurmancî, 2- soranî, 3- dumilî (zazakî), 4- goranî (û gelek şêweyê herêmî yê ênan)" estî.

**Kemal Badilli** zî, vano çehar birrê ziwanê kurdî estî: "1- kurmancî (kurdmanc/ kurmac/kirmanc/ kirmaç), 2- lûrî (lûr, lor, ler), 3- goranî (hewramî, ewremanî, zaza/ dimilî), 4- kelhûrî yan zî soranî)."

Ziwanzan **Qanatê Kurdo** zî kitaba xo ya Gramera Ziwanê Kurdî (Kurmancî û Soranî) de, ziwanê kurdî sey çehar dîyalektan cêra abirrneno: 1- kurmancî, 2- zaza, 3- lûrî, 4-goranî.

Enê agadarîyê corênan ra dîyar beno ke ziwanê kurdî zî xo mîyan de gelek dîyalektan ser o par beno. Ayê ke çend dîyalektanê ziwanê kurdî û tayê xusûsîyetanê eyê esasî bizanê, ên (în) do bivînê ke ferqê dîyalektanê kurdî, ferqê dîyalektanê ziwanandê bînan ra vêşêr nîyo.

(*Ma dîpnotê çimeyan îlawe nêkerdî)

**"Peynîye"**

... Armanca na xebate, çarçeweya xusûsîyetê esasî yê grûba ziwanandê arî mîyan de cigêrayîşê tayê xusûsîyetanê xas ê ziwanê kurdî û dîyalektanê ênan a. Peydabîyayena na xebate de, tayê beş û qonaxan de raya (rêbaza) senkronîk, tayê beş û qonaxan de zî raya dîakronîk û teswîrî ameyê taqîbkerdiş. Na çarçewa de, di dîyalektê kurdî; zazakî (dimilî) û kurmancî, hetê tayê xusûsîyetandê dîyalektî, alfabe, fonetîk û morfolojî ra ameyê veracêkerdene. Sebeb çi beno wa bibo, wexto ke yew ziwanî ra dîyalektê cîyayî peyda bibê, behsê nizdîyê û dûrîya ênan, behsê pêmendişê û cîyayîya ênan zî bena. Hetê esasê dîsiplînê lenguîstîkî ra bi hawayêko objektîf dîyarkerdişê ferqê mabêna her di dîyalektan, gerekîya raya xebata zanistî ya.

Peydabîyayen û bîyayena dîyalektanê cîyayan, rastîyêka tarîxî ya heme ziwanan a. Ziwanê kurdî zî bi dîyalektanê xo ya nê ziwanan ra yew o. Tayê kesî, zafbîyayena dîyalektanê kurdî, sey unsurêko negatîf qebûl kenê û vanê kurdî wayîrê ziwan û kultirêko hempar (hevbeş) nîyê. Bawer kena ayê ke winî vanê, yan ziwanê kurdî û dîyalektanê eye baş nêzanê yan zî zaf sivik fikiryenê. Sey heme ziwanandê dinya, bîyayena dîyalektanê cîyayan ê kurdî, lawazbîyayena ra zafêr, xezîneya bêver û bêpey ya veteyan û zengînîya ziwanê kurdî dîyar kenê. Labelê goreyê şertandê ewroyî yew bi yew nê dîyalektan sero xebate kerdiş, veracêkerden û dîyarkerdena xerîteya velabîyayena ênan, bar û wezîfeyêko giran ê ziwanzanayoxan o.

Wexto ke mesela ziwanê yew millete bo, sey ke verê zî ame vatiş; ziwan eserê têkilîya tarîxî ya yew millet o. No sebeb ra, zaf ziwanzanî yewbîyayena lengûstîkî û yewbîyayena etnîkî-kulturî pêra cîya kenê. Na çarçova de wexto ke ma hetê gramer, vate û viraştişê vateyan, têkilîya kulturî û tarîxî ra zazakî û kurmancî muqayese bikê, qet şuphe çinî yo ke ferqê mabêna ênan, sey ferqê di dîyalektandê yew ziwanî yî. Nê xusûsîyetî, heme ziwan û dîyalektandê grûba hînd-awrupayî mîyan de û ayê bînan de zî estî.

Peynîya na xebate de, ma şênê vajê ke kurdî zî sey heme ziwanêndê dinya xo mîyan de dîyalekt bi dîyalekt cêra abirryena. Bîyayena dîyalektanê cîyayan, seba hemin ziwanan rastîyêka tarîxî ya, gerek kê naye sey çîdêk negatîf nê, sey xezîneyêk dewlemend a ziwanî bivînê. Ferq û nizdîyeya ziwan û dîyalektanê bînan û bîlhesa zî yê koma arî zî hend o seke, yê zazakî û kurmancî zî kemî-vêşî ehend o. Bîlhesa wexto ke şima bala xo bidê beşê fonetîk û morfolojîya na xebate, şima do bivînê nê her di dîyalektî hetê xezîneya vateyan û nameyan, zemîran, sifetan, karan, edatan û bestoxana çiqas seycê yî û çiqas yewbina dûr î. Bêguman nizdîyeya mabênê dîyalektandê kurdî, ferqê ênan ra zaf vêşî ya. Hetê tarîxî û kulturî ra zî, kok û rîçikê etnîkî yê qiseykerdoxandê nê ziwan û dîyalektandê eye şino pêser û yew o.




*Seîd Veroj, "Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî: Diyalekt, Alfabe û Fonetîk", Weşanên Ava, Îstanbul, Gulan 2014, 312 r.*

*"...Bîlhesa wexto ke şima bala xo bidê beşê fonetîk û morfolojîya na xebate, şima do bivînê nê her di dîyalektî hetê xezîneya vateyan û nameyan, zemîran, sîfetan, karan, edatan û bestoxana çiqas seycê yî û çiqas yewbina dûr î. Bêguman nizdîyeya mabênê dîyalektandê kurdî, ferqê ênan ra zaf vêşî ya. Hetê tarîxî û kulturî ra zî, kok û rîçikê etnîkî yê qiseykerdoxandê nê ziwan û dîyalektandê eye şino pêser û yew o."*

# Rola eşîrtî û pirçandiyê di çêkirina îmaja Kurdan de



FEXRÎYA ADSAY

Dı sedsala 20. de Kurdan gelek caran di rojeva Rojava de cî girtine û her welatekî rojavayî bi awayekî, bi kurdan re têkiliya wan heye. Helbet dema têkiliyek hebe derbarê hev de têgihanek (algı) wan jî heye. Lê wek encama têkiliyên hiyerarşîk û newekhev her tim têgihana rojavayiyan ya derheqê kurdan de di siyasetê de bûye diyarker. Ka ev têgihana rojavayiyan a derbarê Kurdan de ji serdema antîkîteyê heta roja me di nav werareke çawa re derbas bûye? Nuri Fırat di Aşiret ve İsyan-Batı'nın Kürt Algısı (Weş. Avesta, 2015, Stenbol) Eşîr û Serhildan-Têgihana Rojava ya Kurd)) de li dû vê pirsê diçe. Di berhemên Herodot, Strabon, Xenephone, Marco Polo, Jean-Baptiste Tavernier, Claudius Julius Rich, Guisseppe Campanile, Austen Henry Layard, Ely Bannister Soane, Cecil Edmonds û gelekê din de Kurd çawa hatine teswîrkirin, çarçoveya vê derdixîne.

Aliyê pirtûkê yê balê dikişîne ser xwe û xwîner bi xwe ve girê dide ev e ku nivîskar baş datîne ber çavên me ku ji antîkîteyê heta sedsala 21. berdewamiyeke bi îstiqrar heye di têgihana derbarê Kurdan de. Ew çerçove ku bêhtir ji aliyê Rich ve tê dîyarkirin û di Edmonds û antropologên wek Martin van Bruinessen de jî berbiçav e, gelek caran tê binxêzkirin. A din, bal dikişîne ka vê têgihana berdewam çi bandor kiriye li ser siyaseta hêzên rojavayî yên li Kurdistanê.

Ji Herodot heta Rich an ji sedsala 4. (B.Z) heta sedsala 19mîn

Di serdema antîkîteyê de bal rasterast ne li ser Kurdan e. Ji ber têkilî û gengeşiyên di navbera Yewnan û Persiyan de bala Yewnaniyan li ser Persiyan e. Herodot, di ser Persiyan re, bi kurtî qala Medan (ku wek pêşiyên Kurdan tên pejirandin) dike ku demekê serdestiya Persiyan kirine. Xenephone jî dema ji sefera dijî Persiyan vedigere pêrgî Kardûkiyan (ku ew jî wek pêşiyên Kurdan tên pejirandin) tê û (di Vegera Dehhezaran de) wek yek ji kêşeyên rêwîtiya xwe qala Kurdan dike. Dîsa Strabon (B.Z. Sed. 3.) û Plutarch (B.Z. Sed.2.) jî ligel Persiyan hema bi kurtî qala "kurtioiyên persiyan" û "kardûkî"yan dikin.

Dema Seferên Xaçparêz jî Selahedînê Eyyûbî di bin siya Îslamiyetê de dimîne. Kurdbûna wî pir kêm an qet nayê qalkirin. Ewilî Persî dû re Îslamiyet li navendê ne û Kurd jî yên li çepera wan in. Ji ber ku li derveyî Ewropayê bala wan li ser împeretoriyên şerqî an yên xwedî dewlet an jî li ser çandên qedîm e.

Heta sedsala 18. jî seyyahan, ji ber ku Kurdistan li ser rêya wan bûye, hema bi kurtî bêyî ku zêde li ser hûr bibin an wek hûrgiliyekê qal kirine. Bi gelemperî jî wek "diz û eşqiya" teswîr kirine û kom an civatên li çeperên şaristanên qedîm hatine dîtin.

Di sedsala 19. de têkiliya Rich a bi Kurdan re yên beriya xwe cuda dibe. Ew wek nûnerê împeryalizma ewropî bêhtir wext derbas dike li Kurdistanê. Her çiqas qalibên beriya xwe dubare bike jî derbarê jiyana eşîrî yê Kurdan de zêdetir agahî dide û tesbîtên wî dibe xala werçerxê di pênasekirina Kurdan de. Li gor pîvanên civakên modern ên Ewropayê eşîrtiyê wek girîngtirîn ferqa Kurdan dibîne û vê wek taybetmendiyek "xwecihbûn"ê pênase dike. Ji lêkolîna xwe ya derbarê Eşîra Caf digihêje wê encamê ku binemalek an binemalne navenda eşîrê pêk tînin û derveyî wan jî binemal û gundiyên bêeşîr hene ku sedeqeta wan a bo eşîrê li gor şert û mercan diguhere. Li gor wê binemala navendî û gundiyên niha ketine bin darê wê binemalê dibe ku ne Kurd bin. Jixwe axaftina wan jî cuda ye. Ji dêvla ku wan wek tebeqeyek civakî pênase bike an li ser vê bifikire wan wek 'nekurd' disenifîne. Diyar e Rich li gor pêşgebûlekê tevdigere ku Kurdên heqîqî bi eşîr in, koçer in, di bin konan de dijîn, şervan û talanker in. Yên gundî nabe Kurd bin. Û helbet di hiyerarşiyê de eşîrtî Kurdan dixe asta nizmtirîn. Wek ziman jî Kurdî bi zaravayên Kurmancî û Soranî tê sînorkirin, zaravayên ji bilî wan wek zimanên cuda bin tê nîqaşkirin. Bi gotineke din, Kurd yekşêwe û homojen in, civateke sabit, negûherbar û ji tebeqeyên cuda bêpar in. Ji ber vê jî nabe 'Kurd' navê neteweyekê be. Êdî ji wê û şûn de gelek caran hatiye/tê nîqaşkirin ku Goranî, Hewramanî, Zazakî zimanên cuda ne, li gor vê tesnîfa Rich ku ji kûrahiyekê bêpar e û xwe naspêre ti daneyan din. Yên piştî Rich, yên heta sedsala 20. jî tê de, çawa bêyî ku tesbîtên wî bidin ber pirsan, wî wek pêşeng qebûl dikin û tesbîtên wî bi gûherînên biçûk her dubare dikin, Nuri Fırat bi hûrgilî vedibêje. Ewqas ku Martin van Bruinessen ku ji çil salan zêdetir e li ser Kurdan dixebite vê berdewamiyê tesdîq dike. Qala bandora Rich a li ser xwe dike û di gotarek xwe ya di sala 2017 de çap bûye de dibêje "heta niha min Kurd wek koçer û nîv-koçer pênase dikir lê êdî ez pênaseya wan bixwe dipejirînim. Kî bêje ez Kurd im, ew Kurd e."

Heta sedsala 18. jî seyyahan, ji ber ku Kurdistan li ser rêya wan bûye, hema bi kurtî bêyî ku zêde li ser hûr bibin an wek hûrgiliyekê qal kirine. Bi gelemperî jî wek "diz û eşqiya" teswîr kirine û kom an civatên li çeperên şaristanên qedîm hatine dîtin.




### Sedsala 20mîn

Êdî di sedsala 20. de yên li ser Kurdan dixebitin ne tenê seyyah, arkeolog, mîsyoner an nûnerên şirketên împeryal in. Bi taybetî piştî Yekem Şerê Cîhanê dewleta Brîtanya başûr (Iraq) dagir kiriye û bi leşkerên xwe, bûrokratên xwe, zanyarên xwe bi cî bûye; hewl dide li gor berjewendiyên xwe serî bi Kurdan re derxe. Beriya sedsalekê serokeşîrekî ji Mîrektiya Baban li Silêmanî ji Rich re gotibû ku ew pêşengê dagirkerên Brîtanî ye lê Rich pê keniyabû! Niha ew texmîna wî bi temamî rast derketiye û ew jî Kurdan tenê wek eşîr dibînin. Hewce nake mirov bikirpîne ku ji Rich vir de, li gor qalibê rûniştî, eşîr her tim wek nîşane an sedema paşverûtiyê tê dîtin. Kurd heta eşîr bin wê nikaribin xwe îdare bikin, bibin netewe û helbet xwedî dewlet jî. Ji aliyekî din ve jî bo rêvebiriya xwe ji eşîrtiyê îstifade dikin, wê dikin xwedî erk. Bo vê, eşîrên biçûk û lawaz xurt dikin heta Kurdên neeşîr bin jî wan dikin xwedî eşîr. Wek mînak, dema yên wek Şêx Mehmûd serî hildidin wan bêhtir bi saya eşîrên din têk dibin û li dijî Şêx Mehmûd eşîrên lawaz tên xurtkirin. Lewma eşîrtî çiqas nîşaneya paşverûtîyê û diyardeyeke pre-modern be jî, Brîtaniyan bo xwe li fonksiyonelbûna wê nêrîne. Ji dêvla ku rê li ber gûherînê vekin bêhtir rêya guherînê girtine belkî dînamîkên hebûn jî ji holê rakirine. Hemû muxalefeta Kurd wek berxwedana awayên civakî yên pre-modern şîrove kirine û bo tepisandina wan û bo berpirsiyariyê ji ser xwe rakin eşîrtiya Kurda kirine hincet.

Dema Kurd bûne xwedî helwesteke ji eşîrtiyê wêdetir ku ber bi neteweyîbûnê ve diçe, ew jî bi awayekî qurre biçûk dîtine an nexwestine bibînin. Wek mînak Edmonds serhildana Şêx Mehmûd û yên din wek konetiya eşîrî; neteweperwerî jî wek bêtehamûlî an biperdekirina hewesên hin serokeşîran şîrove kiriye. Qet nexwestine bi awayekî din ji eşîrê wêdetir li Kurdan binêrin an ji eşîrtiyê pê ve tiştekî din bibînin û her dem entegrasyona bi dewletên serdest re wek çareserî hatiye pejirandin. Fikra entegrasyonê bixwe jî kiriye ku ew têgihîna ji mêj ve her dem bê xurtkirin.

Dewleta Tirkiyeyê di serhildana Şêx Seîd a di 1925an de bi israr xwestin Brîtanyayê tawanbar bikin ku serhildan birêkxistine. Digel ku heta îro jî ti belge nehatiye peydakirin, ev tawanbarkirin berdewam e. Ji ber ku neteweyîbûn ku merhaleyek ji eşîrtiyê wêdetir e û awayekî modernbûnê ye û mafê dewletbûnê jî dike mewzûbehîs, heta ji wan tê dixwazin ji Kurdan dûr bixin, layiqî wan nebînin, wek manîpulekirina armancên paşverû bidin qebûlkirin. Girêdayî vê têgihana ji mêj ve li raya giştî ya Rojavayî jî Kurd bi mafên wan ên ji wan hatine stendin ne lê bi mexdûriyetên xwe di nav çarçoveya mirovatiyê de dikevin rojevê.

Çarçoveya pirtûka Nuri Fırat bêhtir bi Başûrê Kurdistanê ve sînorkirî ye û dawiya sedsala 20. de diqede lê vê jî lê zêde dike, piştî ku li başûr Hikumeta Herêma Kurdistanê di nav qada navnetewî de hat naskirin û êdî bi seroktiya Mesûd Barzanî wek aktoreke siyasî tê pejirandin divê ev tesbîtên li jor bên nûkirin.

### Sedsala 21.

Belê, wek ku Fırat jî diyar kiriye tesewira derbarê Başûrê Kurdistanê gûherîbe jî, li Bakur û Rojhilat bêstatûbûna Kurdan berdewam e û encax di nav çarçoveya entegrasyonê de dibin mewzûbehîs. Lê bi taybetî li Bakur rewş gelekî tevlihevtir e di vê sedsalê de. Ji aliyekî ve û gelheya Kurdên li bajaran ji sedaqetên bo eşîrtiyê dûr dijîn zêdetir e. Çeşitdariya çîn û tebeqeyên civakî her diçe zêdetir dibe. Her çiqas piştî salên 1950î partiyên siyasî yên Tirk di ser eşîran re siyaset meşandine û rê li ber dînamîkên gûherînê girtibin jî, êdî ne gengaz e Kurd di nav pênaseya eşîrê de hilên. Lê tiştê xirabtir, li Bakur di nava sedsalekê de, encama siyaseta dewleta Tirk hişê Kurdan ewqas kolonîze kiriye ku piraniya Kurdan êdî xwe bi xwe ber bi entegrasyonê ve diçin. Helbet xwe nav kategoriya eşîrtiyê de pênase nakin lê ew hizra neteweyîbûnê jî çênebûye. Hatiye wê radeyê ku çeşitdariya zarava, bawerî û mehzeban ketiye dewsa eşîrtiyê. Çawa ku sedsalek berê dihat gotin eşîrtî asteng e li ber netewbûnê, îro zarava, bawerî û mezheb bi heman armancê tên fonksiyonelkirin, him ji aliyê Kurdan bixwe him jî derveyî wan. Sed an dused sal berê tenê seyyah, lêkolîner û antropologên biyanî ev dikirin lê nika siyasetmedar, lêkolîner û akademisyenên Kurd jî tevlî yên biyanî bûne heman tenê aliyên neyênî yên neteweyîbûn û helbet netewe-dewletê derdixin pêş û nîqaş li ser wan dimeşe. Gelek kirin û gotinên siyaseta serdest a li Bakur dikare di nav vê çarçoveyê de bê nirxandin. Tê zanîn di dehsalên dawî de kadroyên diyarker ên PKK gelek caran li hemberî dewletbûna Başûrê Kurdistanê derketine. Niha di pratîkê de vê bêhtir aşkere dikin ewqas ku tevkariya aktorên siyasî yên herêmê ku li dijî serbixwebûna Kurdistanê ne, dikin. Wek mînak Êzidiyên ku heta niha wek Kurdên resen dihatin qebûlkirin li gor siyaseta PKK, bêyî ku tu sedem an daneyên maqûl bên destnîşankirin nekurd tên qebûlkirin, çawa ku siyaseta dewleta Ermenistanê nekurdbûnê li ser wan ferz dike. Helbet ti pênasekirin ne mesûm e û, taybetî li Kurdistanê, li derveyî siyasetê nikare bê şîrovekirin. Piştî vê pênasekirina nû tê ferzkirin Şingal bi Kurdistanê ve ne lê bi Bexdayê ve bê girêdan. Bi kurtî, rewşa niha ya li piraniya Kurdistanê fikr û raman, û texeyûlên Kurdan bixwe ewqas tevlihev û têkel in, êdî her diçe zehmettir dibe mirov dînamîkên derveyîn û yên hundirîn ji nav hev derxîne an jî hev veqetîne.



Dewleta Tirkiyeyê di serhildana Şêx Seîd a di 1925an de bi israr xwestin Brîtanyayê tawanbar bikin ku serhildan birêkxistine. Digel ku heta îro jî ti belge nehatiye peydakirin, ev tawanbarkirin berdewam e. Ji ber ku neteweyîbûn ku merhaleyek ji eşîrtiyê wêdetir e û awayekî modernbûnê ye û mafê dewletbûnê jî dike mewzûbehîs, heta ji wan tê dixwazin ji kurdan dûr bixin, layiqî wan nebînin, wek manîpulekirina armancên paşverû bidin qebûlkirin.



CIWANMERD KULEK

Sê çîrokên Stenbolê-ı

# “Karesat diqedin, senaryo naqedin”



CELAL Salik, quncîknivîsê zîrek ê Pirtûka Reş a Orhan Pamuk, di gotareke xwe de radigihîne ku ava Boğazê diçike. Salik gotinê tîne ser rapor û agahiyên zanyaran û xwendevanên xwe hişyar dike ku ava Deryaya Reş germ dibe, a Deryaya Spî sar dibe, zeviya bin deryayê fireh dibe û ji ber van tevgerên tektonîk ava deryayê dê vekişe qul û qewer û şikeftên ku di zikê erdê de vedibin, û di dawiya vê de mixabin Boğaza delal dê bimiçiqe. Hingê avên pîs ên Stenbolê hemû dê biherikin vê besta genî a Boğazê, nexweşî dê li nav çiravên wê belav bibin, taxên xerabe dê li nav gemara wê peyda bibin, Kız Kulesi ê weku li serê qotekî be xuya bike... Wê çaxê, dema ew roj hat, Salik jî dê şevekê derkeve li Cadillaceke reş bigere, seyareya ku a nijdevan (gangster)ekî berê ê Beyoğluyê bû. Ev nijdevan û hevala xwe, dema ji polîsan direviyan, bi hev re di vê seyareyê de di Boğazê wer bûbûn. Di vê dojeha ku zemanekî bihişta Stenbolê bû û vêga meytên keştiyan, skeletên Kelk û Lîkyayî û Xaçperestan, xezîneyên Bîzansiyan, şûşeyên gazozan, qiyametek alav û kelûpelên dî jê derdikevin de, Celal Salik dizane ew ê wê otomobîlê li kû bibîne. Û dizane gava kevza ji ser camên wê bide alî, li ber ronahiya niftika ku pêxistiye, dê skeletên wî gangsterî û hevala wî di hundirê seyareyê de bibîne; dê bibîne ku herduyan hevdu hembêz kirine, devên wan bi ramûsaneke dawî di hev de mane. Salik, xweziya xwe bi vî awayê herî xweş ê mirinê tîne, ê dema ku mirov rû bi rûyî karesatan dibe û nikare ji mirinê bireve, û –ez kurt dikim – wiha bang li dilbereke nepenî dike: “Delala min, dem û dewrana bobelatan bi ser me de hat, tu li kû yî, de were, êdî dema wê ye ku em hişka hevdu hembêz bikin û li hêviya mirinê bisekinin.”

Ew roj nehatin û Boğaz hîn wek xwe ye; fîrefîra qeyîk û vapor û keştiyan e li ser diçin tên û teyrên qaqlîbaz li ezmanê wê hêlan dibin. Ma tê hişê kê ji ewên ku rojeke xweş, tav, li qiraxa wê bi semtika dimeşin, ku heye ku rojekê ew av ji navê here? Eger here dê kî ji me rabe di besta wê ya ziwa û genî de li saeta bi kostek a Tewfîqê Silêmanî, qelemê zîv ê C. Bedirxan, fera gîzmeya çerm a Xelîl Xeyalî, tizbiya kehrîbar a rîşikkesk a Seyîd Evdilqadir, tasa sifir a Seîdê Kurdî jê noşî, qelûna M. Anter, şehê darîn ên bi neqşên Tebrîzî ê E. Qasimlo û xencera Kurdekî nenas bigere? Lêbelê Boğaz nemiçiqe jî divê dilber werin û dildarên xwe zêde di nav agirê hesretê de li perrê vê deryayê nehêlin. Lewra em her roj di devê qiyameteke dî de ne. Hemin ku Boğaz neçike jî rojekê em ê hemû bimirin.

**Dema ava deryayê rabe**

Zanyar êdî behsa miçiqandina Boğazê nakin, lê me li hember talûkeyeke dî hişyar dikin. Ji ber germahiya gerdûnî û helandina çiyayên qeşayî pileya ava deryayê a li cîhanê dê bilind bibe û heta li gor hin pêşbîniyan bajarên wek Floridaya Amerîkayê heta pêncî sal şûnde dê di bin avê de bimînin. Sê sal in li Stenbolê, vî bajarê ku derya di navê re diçe, dijîm û helbet carina dema datêm qiraxa deryayê diqiliqim bi ihtîmala ku rojekê ev av min jî tevî vî bajarî daqurtîne. Boğaza ku ava deryayê bi çivên narîn di tengava wê re dikişe ji hemû derya û okyanûsên dî xweşiktir e li ber dilê min. Kêfa min ji vê deryayê re tê, mîna kûçeyeke bajêr be di nava bajêr re diherike; kûçeya herî xweş a vî bajarî ye, bi keştiyên xwe yên mirovan ji aliyekî vê kûçeyê dibin ê dî, teyrên wek kulîyên mezin ên berfê bi dora wê dikevin, firoşkarên gerok ên her carê îcadeke xwe ya nû û ecêb di keştiyan de didin nasandin û bi buhayekî erzan difiroşin, muzîkjenên ku sefera li ser wê neqeba deryayê vediguherînin amfîyeke rengîn û zengîn a sazdêranê. Deryayên dî ên bê perr, heta asoyê bê dawî, wek beyaban û çolistanan xuya dikin li ber wê. Lê dema ku her tişt ewqas xerab biçe ji alî siruştê de, ew çiqas dikare xweşik bimîne? 63 sal berê wek îro (24 Sibat) piştî berfeke dijwar dema parçeyên mezin ên qeşayê ji robarê Tûnayê ketin Deryaya Reş û ji wir hatin ketin Boğazê û ew xitimandin, xelk bi kêf û eşq daketibû vê kûçeya ku bi meşeke narîn di nav jiyana wan û bajarê wan re diçû. Lê ku vê carê kêf jî ji me re neserife?

Çaxa rojeke wiha, lê bê berf û qeşa, di keştiya Üsküdar-Beşiktaşê de ji aliyekî Boğazê diçim ê dî, li derve dinerim û xeyal dikim: lê ku îro, hat û bi rastî jî ava deryayê rabû? Mija ku ser Boğazê girtibû li ber çavê min vediguhere ava deryayê a ku radibe. Gir û giyarên bajêr ên ku kaş û berpalên wan bi avahiyan hatine dagirtin ên li herdu rexên Boğazê di bin avê de dimînin. Ji ber ku hemû deryayên cîhanê girêdayî hev in, rabûna ava Boğazê tê maneya bilindbûna pileya deryayê li hemû cîhanê. Nexwe dê bobelat ji hindê ku ez difikirîm mezintir be. Di xeyala min de lehiya avê heta perrên dûr ên bajaran diçe û wan dide ber xwe; şer û cengan, feqîriyê, zengîniyê, berberiyê, liv û tevgerên bê dawî ên jiyana rojane, kar û barên sivik û giran, dayik, zarok, dezgehên bazaran, dormîşên navbajêr, haletên werzişê, telefonên destan û tabletan, pisîkên kûçeyan û tûleyên bêxwedî, siyasetên qiriktahl û mejîkerik bi derbeke demildest, bi şid û boş dixe bin xwe û heta hetayê deng ji wan dibirîne. Dê kes nema hay bibe ji kul û mereqên di dilên wan mirovan de ku masîyên deryayê laşên wan tevî dixwin. Hal û meseleya Kurdê bê dewlet, bê welat û bê nasname ê ku hem mehkûmî zimanê xwe ye hem jî jê mehrûm e, di hucreya neteweyeke bê nesîb de dîl e, ne dikare bibe yekî dî ne dikare bibe xwe, li ser kokeke ji binî de hêdî hêdî hişk dibe hewil dide ku bibe şax û pelekî şîn, dê di cîhana bin avê de mirar bibe. Bêyî ku ti rojeke dî yan şeveke dî a vê gerdûnê kes li skeletê wî bigere û çîroka wî bizane.

Keştiya ku berev Beşiktaşê diçe ji nişka ve li nîvê Boğazê di ciyê xwe de disekine û lê wardiqilim: Keştiyeke dirêj û mezin a barên giran hêdî hêdî di pêşiya a me re derbas dibe. Wê hingê hay dibim ji zilamê qerase ê li nava keştiya me diçe û tê, û bi dengê xwe yê dawidî iddîa dike ku 81 salî ye û wek kevirekî saxlem e. Ji rêwiyên bêdeng re behs dike ku ew dermankerekî şîfabelavkir e, ji xeynî emelîyatê her tiştên dî ên bijîşkî dike û her kes wî dinase; ji rêwiyan dixwaze li rûyê wî yê pîr binerin ku çawa qijlonekek jî tê de tine ye, destê xwe dibe ser zikê xwe yê mezin û dibêje ku xilika wî (hûrmezinî) tine ye, du sê lotikan davêje û dixwaze nîşan bide ku çiqas li ser xwe ye û hîn wek gêncan e. Qala giyayên xwe, kevirên xwe û diayên xwe û derdên ku yek ji wan namîne ku bi wana derman nake jî dike. Pelekî mezin ê A4 ku nav û nîşan û kar û xizmetên ku dike tê de nivîsîne li rêwiyan belav dike û diyar dike ku ji profesoran bêtir bi tiştan dizane û ilmê wî digihêje her tiştî, lê çi fêde wî dibistan nexwendiye, eger xwendibûya dê bibûya şahê vê cîhanê. Li rûyê xortekî dinere û dibêjiyê “li xwe miqate be, dê te çavînî bikin.” Ji keçikekê re dibêje eger were ba wî, ew ê qismetê wê veke û ew ê bizewice. Bi xwe amin e, radigihîne ku ew sêwî bû, bavê wî tine bû, lewma diayên wî giştûk qebûl dibin. Dema keştiya me cardî bi ger dikeve, ez jî kaxetekê ji wî werdigirim û çavekî lê digerînim. Di vê kaxeta ku tê de nivîsiye ku “ti carî wê winda nekin û tim û daîm bixwînin” de dibêje ku Edison elektrîk, Kristof Kolomb Amerîka dîtiye û wî jî kevirê bi potasyum ê dermanê çerman dîtiye. Di kaxetê de gava behsa giya û dermanan dike, di nav re carina gotinên pêşiyan dibêje û carina şîretan dike, mîna “Her kes dibe însan, lê herkes nabe zilam.” Vegotina adresên ku em dikarin wî li wir peyda bikin gosirmeteke nivîsê a bê îmla ye: “Rojên sêşeman li Bazara sêşemê a Kadıköyê, li devê bazarê masîvan hene, jê wir de, li qiraxa newalê qumaşçî hene, bipirsin her kes Şîfakeran nas dike. Çarşemê Bazara Jinan a Fatihê, jora wê Niyazi Sokak, serê goşê çentecî, kêleka wî mirîşkçî, bipirsin her kes nas dike, bêjin Alo. Înê Bazara Fındıkzade, li cadeyê mizgefta li serê goşeyê, li jora wê li kûçeya pêşî a li destê çepê, li pêşiya mixazeya flamingo, bipirsin bazarcî nas dikin yan jî bêjin Alo.” Danezana geş û gurr, a ku wek hawê çiqas dike nake dilê wî li gotinê rihet nabe, wiha dirêj dike û hey dike. Li heman rûyê kaxetê em hîn dibin ku cilên me yên ku em bi ser de li xwe dikin jî dikire, lê eger ne paqij bin nakire. Li rûyê dî ê kaxetê, ku tê de şîreta li gêncan dike ku cixare û alkolê venexwin, di pêşiya mezinên xwe de neçin, seyareyan bi sur‘et najon, bi dengê bilind neaxivin û zûka razên û zûka rabin, derdên jiyana rojane cardî di bîra me de tîne û em kêliyekê kêfxweş dibin ku giyayê ku destava mirov tîne heye, em şaş dimînin ku rûjeke (dermanê lêvan) ku dernakeve heye û ev rûj dema kesk e dibe soravî jî, û em tên serwextkirin ku herçiyê ku ji bo nexweşiyên cur bi cur çûne balê û baş bûne navê xwe û îmzeya xwe danê da ku ew isbat bike û eger em herin ew dikare nivîs û îmzeya wan şanî me bide. Evî “şîfakerê ku porrên mirov derdixe” ji camêriya xwe hin sirrên xwe di kaxeta xwe de jî eşkere dike û radigihîne ku em şebê têxin bin balgiya xwe em ê bi şev nekin xirexir. Helbet, pêwîstî bi wê jî dîtiye û gotiye: ziman, dîn, regez û mezheba mirovan jê re ne mişkule ye.

Qasek şûn de keştî nêzîkî Beşiktaşê, perrê dî ê Boğazê, dibe û ez jî wek xelkê hêdî hêdî ji ciyê xwe radibim. Şîfagerê qerase, qapûtekî dirêj î lacîwerd li nav milan, li ciyê xwe nasekine, keftûlefta wî ye bo ku bi hawara mirovan de biçe. Dema ez nêzîkî derî dibim, dengê wî yê qalind ji pa’re wek ava boş a deryayê bilind dibe: “Piştî ku ez bimirim hûn ê pirr li min bigerin, lê dê êdî pirr dereng be.”

Axir, em giştûk, bi derd û kulen bajêr û ên jiyana xwe, bi hizr, hêvî, xeyal, bazar û hesabên xwe, sax û silamet digihêjin perrê dî ê Boğazê. Xem û fikara meseleyên piçûk ên rojane min ji seqamgîriya xweşkok a dema felaketan diqetîne. Di dilê xwe de mikur têm ku ez jî weke gelek mirovan ji hesta felaketên mezin ên ku mirovan gişan di bêçaretiyeke hevpar de digihîne hev û ji hev re dike dar û pişt, hez dikim. Li perrê dî ê Boğazê her tişt asayî ye û her kes dîsa dibe keç yan kurê bavê xwe. Vêca berî ku ava Boğazê rabe û bajêr tê de xerq bibe, berî ku evî hekîmê Lokman ê şepqeyeke teng li serî ji vê dinyayê bar bike, berî her tiştî, berî ku dereng be, “xezala min, delala min, zû were.”



## Arşîvkar Rifat Sefali bi tena serê bi dehhezaran rûpel dijîtalîze kirin

# Dokûmentên kurdî li ser înternetê ne



Li Hollanda ez ketibûm pey belgeya ku di dema serhildana Zîlan de, Elî Şêr hin name şandibûn Lozanê, wê demê bi eşîran re dicivin û biryarên eşîran wek name dinivîsînin ji bo peymana Lozanê dişînin wir û tê de dibêje em kurd in em ne tirk in lê bi tirka re li vir dijîn, derheqê wan de çi biryar hatiye girtin?



NÛJÎN ONEN

**RIFAT** Sefali yek ji xemxûrên kurdan e ku ji sala 2013an û vir ve li ser arşîvkirina pirtûk, kovar, rojname, bulten, encamên kongre û konferansên partiyên siyasî û belavokan dixebite, wan dîjîtal dike û li ser rûpela www.arsivakurd.org diweşîne. Sefali ji navçeya Madena Elezîzê ye. Ji ber derxistina kovara Roja Welat du caran hatiye girtin û cara yekem 3 salan di girtîgehê de maye. Piştî ji girtîgehê derketiye ji ber ku navê Roja Welat nehatiye qebûlkirin kovara xwe bi navê 'Vatan Güneşi' derxistiye. Piştî çar hejmaran dîsa rastî êrişê hatiye û hatiye girtin. Vê carê jî dîsa 3 salan di girtîgehê de maye. Piştî sê salan dema ji girtîgehê derketiye ji ber kovara 'Vatan Güneşi' mehkûm bûye ji bo li hember vê biryarê derkeve serî li mehkemeya bilind daye lê di nava 6 mehan de sûcê wî hatiye pejirandin. Ji ber vê sedemê mecbûr maye ku biçe derveyî welêt. Ji sala 1994an ve li Swîsrê dijî. Çûyîna Sefali ya derveyî welêt him ji bo wî him jî ji bo kurdan rewşeke erênî derxistiye holê, ji ber ku li wir dest bi karê arşîvkirina dokumentên kurdî kiriye. Arşîvkarê kurd li wir 2 salan beşa Mîkrografiyê xwendiye. Destpêkê dokumentên Swîsreyê dîjîtal kirine pişt re jî dest bi dîjîtalkirina dokumentên kurdî kiriye. Kurdên ku bixwazin lêkolîn an xwendina van belgeyan bikin dikarin malpera arşîvakurd bitikînin û wan belgeyan daxin ser kaxizan jî. Arşîvkarê kurd Rifat Sefali ji Heftenameya Basê re behsa arşîva kurdî kir.

**Papaz, mîsyoner konslatên dewletên Ewropayê dokument û belgeyên me dizîne**

Rifat Sefali çawa dest bi vî karî kiriye, çi bûye sedem ku berê xwe daye arşîvkirina dokumentên kurdî wiha amaje dike; "Di gelek karan de xebitîm. Dawî min biryar da ku li ser Mîkrografiyê bixebitim. Ez çend salan li ser karê arşîvê xebitîm, me arşîva Swîsrê dîjîtal dikir. Qirna 16 û 17an de me dîjîtal kir. Di wê demê de min got em arşîva xelkê dîjîtal dikin çima em arşîva xwe dîjîtal nekin û min li wir ev biryar da. Li Hollanda komeleyeke me hebû, Komeleya Çanda Karkirên Kurdên Hollanda (Koç-Kak) di sala '85an de vekiribûn. Bi çend hevalên me ve di destpêkê de em li ser arşîvkirina dokumentan xebitîn lê wext derbas bû me dît ku civandina arşîvê de dema tu wek saziyekê xebatan neke tu ji dewletan nikare dokumentan bistînî, ji ber wê me biryar da em arşîvê bigirin ser navê komeleya Koç-kakê. Ev komele 40 sal e li wir heye û fermî ye û bi vî awayî em baştir dikarin dokumentan berhev bikin. Li Hollanda ez ketibûm pey belgeyeke ku di dema serhildana Zîlan de, Elî Şêr hin name şandibûn Lozanê, wê demê bi eşîran re dicivin û biryarên eşîran wek name dinivîsînin ji bo peymana Lozanê dişînin wir û tê de dibêje em kurd in em ne tirk in lê bi tirkan re li vir dijîn, derheqê wan de çi biryar hatiye girtin bi îmzayên destnivîskî ne ew belge. Ez pê hesiyam ku ew belge li Hollanda ye. Dema ez ketim pey vê belgeyê min dît ku li wir têra xwe derheqê kurdan de dokument hene. Papaz, mîsyoner, konslatên dewletên Ewropa yên li van deran xebitîne, têra xwe dokument û belgeyên me dizine, birine wan deran. Brîtanya, Awusturya, Almanya, Fransa dokumentên Kurdan di salên dawî de firotine û dewleta Hollanda ev dokument kirîne. Min serî lê da min got ku van dokumentan bidin min wek maddî dibe ku yê we be lê wek manevî ev dokumentên kurdan e. An kopya wan bidin min an jî em bên vana dîjîtal bikin ji ber ku ev dîroka me ye."

Arşîvkarê kurd balê dikişîne ser belge û nameyên di destên dewletên biyaniyan de û rewşa heyî wiha radixe berçavan. "Di dema serhildanan de çi bûyer qewimîne, dewletan çi biryar girtine û kurdan di navbera xwe de çi kirine ji ber ku kar û xebatên mîsyoneran ev bû, dema ingilîz li van deran serdest bûne mîsyonerên ingilîzan hatine Kurdistanê di nav millet de gelek tişt berhev kirine û birine. Awusturya jî gelek tişt birine. Wisa tesadufî em gîhaştin van belgeyan ji ber ku dema me kar û xebatên arşîvê bi rê ve dibir destpêkê me got em kovarên kurdan berhev bikin ji ber ku kovar ji demek şûn de di dest kesî de namînin. Têra xwe arşîv li cem min hebûn, li Koç-Kakê jî pir arşîv hebûn ji ber ku ew komeleyeke kevn bû û hemû weşan dihat van deran jî. Ji sala 2013an de min dest pê kiribû niha arşîv gihaye merheleyeke pir xweş."

**Arşîva ku em di înternetê de diweşînin bê pere ye**

Sefali bi kovarên kurdî dest bi karê arşîvkirinê kiriye lê roj bi roj karê xwe berfirehtir kiriye, merheleyên ve yekê wiha ji me re vedibêje; "Di destpêkê de min bi kovaran dest pê kir, piştî berhevkirina kovaran me got em kovaran berhev dikin çima belgeyên din em berhev nakin? Têra xwe partî û rêxistinên kurdan hene. Destûr, bername, biryarên kongre û konferansê... wan jî dîjîtal bikin bila di arşîvê de bimîne. Ji ber ku tu nikare arşîvê ji hevûdu veqetînî. Çi hatibe nivîsandin divê di arşîvê de cîh bigire. Belavok, destûr, bername, biryarên kongre û konferansên partiyan jî me berhev kirin. Dema ev qediya me got pirtûkên me hene. Pirtûk hêsantir bû lê di nav hêsaniyê de zehmetiya wan jî hebû." Sefali li ser zehmetiya arşîvkirina belgeyên kurdî jî him ramanên xwe him jî gazindê xwe wiha tîne ziman. "Zehmetî ji vir dest pê dike; kurd gelek tiştên wan hene lê hiqûqa wan nîne. Li Ewropayê tiştên weşankirî rasterast tu nikare biweşînî ji ber ku heqê telîfê heye di kovar û rojnameyan de ev tişt tune ji ber ku demkî ne. Lê pirtûk wek tîcarî tê hesêb, ji ber wê xwediyê pirtûkan bi gelemperî jî kurdên me em nikarin vê yekê bi wan bidin fam kirin. Yek bi yek dema ez bi wan re diaxivim dibêjin karekî pîroz e, dîjîtal bike û biweşîne lê dema ku ez dibêjim ka îmzeyekê bidin min bo biweşînim ti kes îmzeyê nade. Demeke dirêj ez fikirîm min got dikarin bibêjin ev pere jê qezenc dike lê arşîva ku em di înternetê de diweşînin bêpere ye. Her kes dikare bixwîne, daxîne, kopî bike."

Arşîvkarê kurd di destpêkê de ji ber tunebûna derfetan zehmetî dîtiye lê niha hacetên vî karî kiriye û li mal karê xwe berdewam dike li ser vê yekê jî wiha diaxive; "Bi scannerên biçûk mirov nikare belgeyan dîjîtal bike divê profesyonel be, tunebûna wan pirsgirêkek bû. Li cîhê kar ez bi karmendan re axivîm, min got ez dixwazim arşîvên xwe jî dîjîtal bikim. Misadeya we heye, wexta ku ez karê xwe diqedînim 1-2 seatan arşîva xwe jî dîjîtal bikim? Min behsa naverokê jî ji wan re kir, min got arşîva min arşîva kurdî ye, rewşa me jî ev e ez dixwazim tomar bikim an na wê tune bibin. Qebûl kirin, gotin tu dikarî dîjîtal bikî lê Ewropayî ji van tiştan fêm nakin û karê belaş tune ye. Bêperê kes ji kesî re naxebite. Di destpêkê de gotin çend rûpelê wê dîjîtal bike û xelas bibe lê min di demek kurt de nêzî 20 hezar rûpel li wir dîjîtal kir. Min dît hêdî hêdî di nav xwe de minaqeşe dikin, dibêjin xoce karekî baş kiriye îsal pir pere qezenc kiriye lê tu nikarî bibêjî ez ji vî karî pere qezenc nakim. Hecetên profesyonelî têra xwe buha ne. Min scannerek kirî min got ez li mala xwe karê xwe berdewam bikim dê baştir be. Min hinek deyn kir û kredî jî stend û li malê min dîjîtalkirina belgeyên kurdî berdewam kir."

Di dema serhildanan de çi bûyer qewimîne, dewletan çi biryar girtine û kurdan di navbera xwe de çi kirine ji ber ku kar û xebatên mîsyoneran ev bû, dema ingilîz li van deran serdest bûne mîsyonerên ingilîzan hatine Kurdistanê, di nav millet de gelek tişt berhev kirine û birine. Awusturya jî gelek tişt birine.

**Heta niha min 538 kovar û rojname dîjîtal kiriye**

Rifat Sefali li ser naveroka arşîvakurd jî zanyariyan bi me re parve dike û dibêje; "3-4 beşên arşîvê hene, beşek ya rojnameyan yek ya kovaran, beşek ya pirtûkan e. Pirtûk jî me li gor zimana veqetandiye, ji xeynî zimanê kurdî zimanên biyanî jî tê de hene; tirkî, ingilîzî, fransî, flemenî, swêdî derheqê kurdan de çi pirtûk derketine kesên ku me ji wan mafê weşankirinê girtine em wan diweşînin. Beşek jî destûr, bernameyên partî û komeleyan e. Heta niha hejmara kovar û rojnameyên ku min dîjîtal kiriye 538 e, lê ev di nav xwe de bi jimar in."

**Min ti kovar li cem xwediyê kovaran nedît**

Rifat Sefali mînakek balkêş dide û qelsbûna arşîvkariya di nav kurdan de nîşan dide û wiha dipeviye; "Mesela min ti kovar li cem xwediyê kovaran nedîtiye. Em bibêjin kesên berpirsyar hene min li cem wan arşîv nedît, hin partî û rêxistin hene kovarê wan yê siyasî, îdeolojîk û polîtîk in li cem hin partiyan min kovarên wan peyda nekir. Rasterast alîkarî jî nedan. Di hin kovar û rojnameyan de kêmasî hebûn, kes nabêje na, her kes dibêje erê emê bişînin kar û xebatekî pîroz e lê tiştên di destê xwe de naşînin."

Li kîjan welatî, bajarî kurd hebe Sefali dokumentên bi kurdan re têkildar be, berê xwe bi wan deran ve dike da ku li arşîva kurd zêde bike li ser vê yekê jî wiha diaxive; "Yên Azerbeycanê heye kurdên wir li rojnameya bi navê Dîplomat derdixin nêzîkî 330 jimar e. Yê Rojhilata Kurdistanê heye, yê Binxetê heye, me got bila tenê yê bi tîpên latînî bê dîjîtal kirin. Rojhilat, Başûr û Binxetê gelek kovar bi tîpên erebî ne lê bi kurdî hatine çapkirin. Tîpên erebî zehmet e em nikarin lê rojnameyên wan yên ku bi tîpên erebî hatiye çapkirin... ji wan jî têra xwe me dîjîtal kiriye lê hîn me ne weşandiye ji bo wê alîkarî pêwîst e."

**Kurdên Ermenistanê beriya me bi tîpên latînî kovar derxistine**

Rifat Sefali li ser bidestxistina arşîvên di destên dewletên biyanî de jî wiha axivî: "Yê Hollanda me serî lê da ye, yên ku di destê Hollanda de ne tenê ne yê Hollandaye, yê Brîtanyaya, Awusturya ye jî, ji ber ku ji wan jî bi pera kirîne. Lê bi Ermenistanê re jî min têkilî daniye wan soz dane min ez ê ji wir bigirim, li wir tiştekî din heye niha em kurdên Bakur di çapemeniyê de em dibêjin tîpên latînî bi Bedirxaniyan dest pê kiriye lê dema ez bi kurdên Ermenistanê re peyivîm wan beriya me bi latînî kovar derxistine. Nîvî bi kîrîlî nîvî bi latînî li Êrîvanê beriya me 40 salî kovar derxistine. Di destê me de nîne lê min hewl daye ku biçim wan jî bigirim û têxim arşîva kurd."

